

ARMANC  
Xwedî : Yekîtiya  
Karkerên  
Demokratên  
Kurdistanê  
★  
Ji mehê carekê  
dertê  
Hejmar : 67  
Çileyê pêşî 1986  
Buha: 10 Skr  
2.5 DM

# Armanac

ARMANC  
Issue by  
The Democratic  
Union of  
Kurdish Workers  
★  
Monthly Kurdish  
Magazine  
Nr: 67  
December 1986  
Price: 10 SK  
2.5 DM

SERXWEBÛN • DEMOKRASÎ • SOSYALİZM

Adress : Nordenflychtvägen 20, 112 51, Stockholm, Tel : 08 - 52 87 56 □ Adresa têkilî û naman : P.O. BOX 240 12, 750 24 Uppsala / SWEDEN □ Postgiro : 50 37 99 - 9 □ ISSN 0348-7388

Netîca Mehkema Komela Jinanen Demokratên Şoreşger

## Ji 6 jinên Kurd re 48 sal ceza hat dayîn



Endamên DDKAD ê di meşekê de

□ DDKAD (Komela Jinên Demokratên Şoreşger) di 29'ê çileyê pêşîn ê 1977'an de avabû

★ Dadgeha leşkerî ya Diyarbekirê, ji ber pîrozkirina 8 Adarê, roja jinan a navnetewî li serhev 48 sal cezayê hepsê, 16 sal û 8 meh cezayê nefikirinê da 6 jinên Kurd.

★ Ji bilî vê li gor biryarê ev 6 jinên Kurd wê nikarin di tu dezgeheke devletê de kar bikin. Ew endam û berpirsiyarên DDKAD'ê ne.

DDKAD di 29'ê çileyê pêşîn a sala 1977'an de hat damezrandin. Damezrênerên komele, armanca DDKAD'ê wiha di dan ronîkirinê: "Me jinên

demokratên şoreşger, di welatê xwe de pêwistiya damezrandina komeleke jinan, ya merkezî dît û me dest bi xebata xwe kir. Ji ber hin zordariyên me-

tingehkaran damezrandina komela me bi derengî ket.

...Ji bo ku jinên me, bi awakî xurt di têkoşîna demokratîk de cihên xwe bigrin, divê ji bin te-

sîra asimilasyonê derkevin. Loma ji komela me, wê li dijî asimilasyonê xebateke bêhempa bike. Ji bo pêşveçûna zî-

*Dumahik di rûpelê 7'an de*

### DIJMINÊN HER TIŞTÊN ÎNSANÎ

□ Mehkema leşkerî ya Diyarbekirê, ji ber pîrozkirina 8'ê adarê, cejna jinan a navnetewî cezayên giran li endam û berpirsiyarên DDKAD'ê birî. Gelo di dinyayê de mirov dikare welatêkî din nişan bide ku ji ber pîrozkirina 8'ê adarê jinên wî welatî bi cezayên ewqas giran hatibin mehkûmkirin?

Helbet ev yek, ne bêsedem e. Di dîroka Kurdistanê de piştî komela pêşketina jinên kurd (*Kürt kadınları Tealî Cemiyeti-Istanbul- 1919*) DDKAD komela jinan ya merkezî ya yekemîn e. Wek rêxistinekê wê bi awakî berfireh rê û dirb û imkan vekir ku jinên kurd ji berê xwe bidin rîya hişyarbûna netewî û civakî, di xebata rizgarxwaziya welat de cihê xwe bigrin.

DDKAD herwiha li ser awakî zanistî hatibû avakirin, bi destûr û programa xwe, bi prensîb û perspektîfên xwe hişyar bûn û zanîneke ilmî pêşberî endamên xwe dikir, têkiliyên rîya tkoşînê bi rewşa netewî û navnetewî, rewşa millî û civakî li ser mîzaneke rastin bi wan dida zanin. Li ser vî esasî ji DDKAD roj bi roj berfirehtir dibû, li gelek bajarên Kurdistanê endamên wê pirtir dibû, bi aktîfî di meş û xebatên cûrbecûr de cihê xwe digirtin. A ya ku di jinan ditirsand ev bû. Loma ji di dîroka Kurdistanê de ev cara pêşî ye ku jinên kurd ji bo xebata komela xwe wiha cezayên giran dixwin.


Lê tevgera jinên Kurdistanê parçeyek e ji tevgera rizgarxwaziya Kurdistanê. Dijminê mêtîngêhar tu carî wê nikaribe vê tevgerê bipelçiqîne. Jinên Kurdistanê wê şîarên DDKAD'ê li erdê nehêlin û yekîtiya tevgera jinên Kurd pêşdetir bibin.

Bi vê biryara mehkemê, helbet têkoşîna jinên Kurd nehateye rawestandin. Lê tiştê ku baş xuya bûye ev e. Mêtîngêharên Tirk dijminê hertîştên însanî ne.

### Piştigirîya navnetewî bi Şêxmûs Cibran re


□ Şoreşgerê Kurd ê heja Şêxmûs Cibran di 8'ê çiriya pêşîn de li Kurdistanê hatibû girtin. Di pê girtina wî re li Swêd komîteyeke piştigiriyê hat avakirin.

Di vê komîtê de parlamenterê komunîstên partiya çep Oswald Söderquist jî cî digre. Komîte di 24'ê meha 11' an de belavok ji hemû rêxistin, partî, parlamenter û kesên din re şand û ji wan daxwaz kir ku ji serokwezîrê Tirkîyê, ji serokê meclîsa Tirkîyê û serokê komela abûqatên Anqerê û Diyarbekirê re telgrafaş bişînin û ji wan daxwaz bikin ku bila îşkence li Şêxmûs Cibran nebe û mafê alîkariya hiqûqî jê re bê dayîn. Bêyî vê xebata komîtê, radyo û rojnamen Swêdî jî bi firehî li ser girtina Şêxmûs Cibran sekinin û informasyonê xwestine. Şêxmûs nuha li Diyarbekirê girtî ye û hîn derxistinê mehkemê. Li gor agahdariyên ji welêt hatin, Şêxmûs Cibran ji meh û nîvekê bêtir di bin îşkence de maye û tade û lêdan û îşkencek gelek hov lê hatiye kirin.



Li Wanê gundan  
vala dikin

Xebera wê di rûpelê 6'an de



Ehmed Türk bi parlamenterên SHP'ê re

### Dewlet sîleh dide eşîran û wan bi hev dide kuştin

□ Gundî bêyî destûr nikarin herin ser erdên xwe

Li herêma Mêrdînê eşîr yek bi yek tên fişkirin. Di fişkirinê (girtina lista navan de) de pîrek û zarok û rismen wan jî tên girtin. Cûnta xwînrêj bi vê jî nayê ser, di nav eşîra de kî bi nav û deng e û av jê sar û germ dibe, merivên wan ê nêzik kî ne jî tê nivîsandin.

Bi zîlm û zora cûntayê û operasyonên ten kirin re Kumandarên Urffî îdarê destûrê nadin ku millet çandiniya xwe bikin. Ji bo çandiniyê dibê gundî ji urffî îdarê îznê bixwazin û belgeyek destûrê bigrin. Li ser vê yekê parlamenterê SHP ê Mêrdînê Kenan Nehrozoglu û Ê Rûhayê Vecihî Ataklı çûn li der dora Dêrik û Qezê (Qiziltêpe) geriyên li gilî û gazinên millet guhdarî kirin. Di dema vê gerra xwe de çûn Qesra Qenco gundê Ahmet Turk. Lê çarhawêlî Qesra Qenco ji alî leşkaran ve hatibû girtin û di destpêkê de nehiştin ku her du parlamenter herin nav gund. Çaxa fahm bû ku her du parlamenter in hîn berdan nava gund. Ahmet Turk jî her du parlamenteran re got ku "Wek hûn dibînin kes nikare bi mêvanî jî bê mala min, ên tên paş de tên vegerandin û mala min ji alî leşkaran ve hatiye îşxal kirin û telefona min jî tê guhdarîkirin." Û axaftina xwe wiha da domandin. "Beşîr Turk, Nezir Yavûz û Suleyman merivên min in, sîcên wan kirine ez jê ne berpirsiyar im. Tiştên bûne li derî îrada min bûne. Lê dijminên me muxbîriya dikin û min berpirsiyarê hedîsên bûne nişan didin." Cûnta faşîst zorê dide Ahmet Turk û jê re dibêjin bîne merivên lên tên gerandin, berdest bike, û dibêjin, "Heger tu wan teslîm nekî emê te bidin kuştin".

*Dumahik di rûpelê 7'an de*

Midyard

### Şivanek hat kuştin du cendirma întîxar kirin

• Li Îdlîlê ji 9 gundan 25 kes li qereqolê di bin îşkencê de ne.

□ Birligek ji tugaya cendirmên Mêrdînê di sînorê Kurdistanê Iraqê de di alarmê de ye û hero diro zîlm û zorê li xelkê herê mêdîke. Li hember vê hovîtiya wan du eskerên Tirk êdî debar nekirin û bi rê ve xwe ji erebê avêtin, întîxar kirin.

Car din, di wexta operasyonê herêma Midyardê de eskerên Tirk xortekî şivan kuştin. Piştî heftakî meytê lêwîk ji alî merivên wî ve hat dît. Îcar ji hêzên mêtîngêhar xwestin xwîna wî têkin stuyê hin gundiyên din û rabûn çend kes girtin. Lê belê vê kirina leşkerên Tirk hîn behtir kerba gel zêde kir.

ÎDLÎL

Çendekî berê ji bo tehqîqkirina zor û zîlma ordiyê du parlamenterên SHP'ê çûn herêma. Li gor beyanên van her du parlamenteran li gundên dora Îdlîlê ji eskerên Tirk êrîş dibin ser gundiyan: parlamenteran di beyanê xwe de gotin ku ji 9 gundan 25 kes, ev 23 roj in ji sî-



Kurdologeka Fransî;  
Joyce BLAU  
Mehmûd LEWENDÎ

*Nivîs di rûpelê 8'an de*

*Dumahik di rûpelê 7'an de*

Li Ser Edebiyata Zarokan

Ebubekir PAMUKÇU

Stiriyên me

Bavê Nazê

DIVÊ MERIV WEK XWE BE

-4-

Ev dem wek "dema macera" ji te binavkirin. Sebebê ku dema macerayê jê re gotin, zarokên vê demê enteresak wan a mezin ji macereyan re heyê.

Û di nabêna 11-12 an de dema kamîlûnê, di jiyana însan de dema herî kirîftîk e. însan, li ser pirekê ye. Li seriyekî pîrê. Li seriyekî pîrê zarotî, li seriyekî ji xortanî heye.

Ew rewş, ji bona kesên ku bi edebiyata zarokan mujul dibin, ji wan re rê li gelsek enteresant vedike. Edebiyata ji bo însanê berzewanac tê çêkirin gelo divê têkeve kîjan katagoriyê? Têkeve edebiyata zarokan, yan edebiyata xortan? Bi qasî ku ez dizanim, li Tirkiyê di vî warî de tu tesbîtek diyar (vekirî) tune bû.

Lê belê li Swêd ji ber neticeyên pêşkêtinê civakî rewş hinekî cuda ye. Li vir edebiyatek bi navê edebiyata berzewanî (kamîlûnê) dest pê kiriye. Hin nivîskarên ku ev beşa ji xwe re vek sahak xebatê ya ciddî hilbijartine, gelek pirtûkên ji hev xweştir ji bona zarokên di van salan de nivîsandine.

Lê belê em dê bûyer û pêşkêtinên di vî mewzûyê de li derî wê nivîsandinê bigrin û bi kurtayî bala xwe bidin zarokên berzewan.

Di van salan de zarok êdî bi cinsiyeta (bi ferqiyata lawik û keçik bûnê hay bûn) xwe hay dibe. Lawik bi peya (mêr) bûna xwe, keçik bi jînbûna xwe gerek di guherandinê de bedena (laşê) xwe de, gerek ji li hember cînsên hember dest pê kirina hisên cînsî û bi meraq di rexê hisên nuh, hesretê nuh, daxwazê nuh de ne.

Lawik, kêf û heyecana xortaniya xwe, keçik ji kêf û heyecana qîzaniya xwe bi dizî dijîn. Serhişk in, înatkar in, bi problem in...

Wexta çirokan êdî bi şûn de maye lê pirtûkên macerayê cardin di rexetê de ne. Li gel têkiliyên ciwaki, bi taybetî têkiliyên di nabêna keç û lawan de êdî derketiye plana pêşiyê. Hinekî ji wek îspat kirina mezinbûnê li hember romanên hisî û evîndariyê meylek, daxwazek berbîçav tê dîtî di van salan de.

Lê em cardin ji diyar bikin ku, di hilbijartina mevzûyê de reçetadayin ne mumkun e. Ji vî de ji bibe, zarok mawcûdiyetek (hebûnek) sosyal e. Tekamul (înkîşaf) û enteresa zarokan li gor demê, civatê guherandinên (ferqiyatên) ge-

lek mezin nişan dide. Ya baştir, ya rasttir ev e ku bi zanebûna tiştên di vî warî de hatine gotin re, nivîskarê, pedegogek civata xwe zarokên civata xwe nasbike. Reçetak ji vêya hin baştir nabe.

Di edebiyata zarokên de ziman

Sala 1975 an, di civînekê de ku Radyoya Stenbolê pêk ani bû yek ji nivîskarên ku tevî civînê bû bû, dema gotibû ku nivîsandina pirtûkên zarokan ji nivîsan pirtûkên ji bo mezinan hîn diwartir e, min ev yek qet nikarî bû qebûl bikira. Sebebê wê nizamî; lê ev hukum, yanî gihandina neticak wisa qet ne ketibû serê min. Sebebê ku bi min rast nedihat belkî ji ber tunebûna hin mesnedên nivîskar bû yan ji ew sebebên ku nişan didan bi min ne tu sebeb bûn.

Lê belê ev entîtersan ew e ku, vî tiştî îro ez ji dibêjim: nivîsandina pirtûkên zarokan, ji nivîsandina pirtûkên ji bo mezinan hîn diwartir e. Lê niqta ku ez jê hereket dikim bêtir mitabîqê rastiyê ye, bêtir bawerî pê tê û rast e. Û bi vî hawî jî dixwazim ku wî hukmê jorîn vekim, hîn baş ronî bikim: ji bona kesên ku mijûliya wan a esasî ne nivîsandina pirtûkên zarokan be, nivîsandina pirtûkên zarokan, ji nivîsandina pirtûkên ji bona mezinan hîn diwartir e. Û ev diwartir ji jî ber zimên û uslûpê, divê vêya jî tavilê bibêjin.

Her nivîskar heta dema ku azad e bi ser dikeve. Ev azadî bes ne azadiya fikrî ye. Ji xwe azadiya di vî manê de a nuha ne di mevzuwa me de ye. Li vî derê ya qal dibe, azadiya zimên û îfadeyê ye.

Zimane pirtûkên zarokan li gor xwe hin xususiyetên xas dixwaze. Dema em li têkiliyên zarokan dinêrin vêya dibînin. Ji sala sifir û pê ve (ji roja tê dinyê û pê ve) zarok bi zimên re di nav têkiliyayê de ye. Lê belê ev têkiliyayê pasîf e. Ev têkiliyayê pasîf, ji derve bê mane ye, lê belê di esasê xwe de li gor zarok pîrr tişt îfade dike û bi hin dengên ku em jî tê digihîjin derbasî rewşek aktif dibe. Û piştî bi mehan zarok cara pêşîn, dest pê dike gotinê rast yê aidê wî zimane ku tê axaftin, dibêje.

Hejmara gotinên (kelîme) ku zarokêkî 18 mehî dikare bibêje ji çend heban derbas nake. Lê belê xezîna zarok ya gotina dewlemendkirina xwe dide domandinê... Zarok gelek tiştên ku dixwaze, bi alîkariya îşaretan, bi gotinên ku fêr bûye dest bi îfade kirina wan dike, yanî diaxîfe. Lê belê axaftina rast (temamî) di salên çaran de dest pê dike. Zarok di nav hewla çêkirina cumleyên serast de ye. Berê cumleyên ku ji yek gotinê (kelîme) îbarek bûn digênên di gotinan, hetta dikarin bigênên sê, çar

gotinan. Lê cardin jî dikare bê gotin ku, zimane di nabêna salên 2, 5 de zimanekî gotinan e. Zarok pîrr zû gotinên nuh fêr dibe, gotinên ku fêr dibe dixwaze bi kar bîne û bi kar tîne.

Ber bi sala 7'a enteresa zarok a li hember gotinan êdî hatiye rewşekê ku qet nikare dev jê berde. Li gel daxwaza fêrbûna gotinên nuh dest bi listika gotinan dike. Çêkirina gotinên nuh, gotina bi şiklên têvel û bi manayên cuda bikaranîn... Bi kurtayî listika bi gotinan...

Dema zarok dest bi dibistanê dike êdî daxwezê xwe tiştên dibihîze û difikîre dikare îfade bike. Lê gotinên wî cardin jî bi sînore, îfade cardin sade ye.

Û her ku diçe, bi derbasbûna salan ve gotinên ku zarok bi kartine zêde dibin, cumle dirêjtir dibin û ji basîtîyê xelas dibin. Divê nivîskarê pirtûkên zarokan wan xususiyetên hemûyan bigre ber çavê xwe. Di zarotiye de tu bigre hema hema her demekî li gor xwe zimaneke wê heye. Divê ew ziman baş bê zanîn, baş bê bi kar anîn. Lê belê cardin jî bi mûhakermak tevayî di nav helemperîya pirtûkên zarokan de di der heqê zimên de em dikarin vîya bibêjin.

Berî her tiştî, divê zimane pirtûkên zarokan sade be. Gotin, divê ji yê ku zarok her roj bi kartine, bi kêmasî jî gotinê ku her tim dibihîze baste hilbijartin. Îfade divê raste rast e. Bê şik girêkî ji bona pirtûkên zarokan jî pêwîst e. Hela zarokên ku hin di salên çirokê de hertim li girêkan digerin. Lê belê girêkên ku bi tu hawî nayên verişandin ji tehamula zarokê jê re tune.

Yên zarok dixin heyecanê, girêftîkên biçûk in. Lê zarok ji bona vîsandina girêkan naxwaze gêj jî bibe. Ew, dixwaze di demekî de girêkan vîrandî û derbasî girêkên nuh be. Divê jî mehmûm (kayram) û teşbîhên ku hefta zarok nagre û loma jî nikare qebûl bike jî meriv xwe dîr bike. Lê belê di seranserê pirtûkê de hakim bûye, tiştê ku di demê de tê bi kar anîn tavilê û bi hêsariyê tîne ber çavan sembolên (tîmsal, remz) wisa bi hêsariyê dikare bîn bi kar anîn. Hetta dema jî hostayî bibe bi kar anîn ji vana pîrr dikare fêde bibe dîtî.

Dibe ku nayê bawerkirin lê, esasê meselê ev e: Ev basîtî ne yê ku karê nivîskar diwartir dikan bes ev basîtî... Nivîskar ew e, ew merivê ku dibihîze, hîs dike û dijî. Berî ku pirtûkê binivîsinê bi rojan, bi mehan, hetta yek carna bi salan berê, pirtûka ku wê binivîsinê dest pê dike dijî. Her bûyerê, di pirtûkê de, her rûpelê, her paragrafê, hetta hetta di her xettê de dijî nivîskar.

Û demek wisa tê ku, nivîskar, êdî bi pirtûka ku tesawûr dikir tije bûye. A jî xwe di vî merhalê de karê nivîsandinê dest pê dike.

Dema nivîsandinê, nivîskar, naxwaze li kelîman bifikire. Gelek caran jî vêya re hewcedariyê jî nabîne. Ji ber ku ev jî xwe di serê wî de ne. Ew bêyî ku pê hay bibe kelîme tîn jî xwe re ciyê xwe digrin.

Nivîskarekî ku ji bo mezina dinivîse, dema pirtûka xwe dinivise ji vî alî de hetta tu bixwazî azad e. Lê carê jî bifikirin ku nivîskarekî wisa rabûye dixwaze ji bo zarokan binivîsinê. Di dema nivîsandinê de wê her tim xwe ragre, wê li hember zimane xwe sansûrê bi kar bîne û bi vî hawî jî ew hedîsa ku jê re konsantre tê gotin wê bi destê xwe bide aliyekî. Yan jî piştî nivîsandinê wê gelek cara kelîman biguherîne, wê bi avakirina cumlan bilize...

Û wê jî navê wêya re jî bibêje nivîskariyê. Nivîskariya wisa nabe. Vîya ger bibe bibe listikek e, ger bi hawakî hîn optimist bibêjin xapandinek e; xapandina însan a xwe bi xwe... Lê li ba nivîskarên ku edebiyata zarokan jî xwe re wek saha mijûliya esasî hilbijartine rewş gelek cuda ye. Wek her nivîskariyê ev jî dema hamiletîyê dijîn. Û ew jî di dawiyê de (di neticê de) li ser serê kaxetê rûdinê. Û ew jî dest bi nivîsandinê dikin heta tu bixwazî bi azadî... Ji ber ku li ba wan hilbijartina cumloyan (kelîme), hilbijartina cumloyan û heya lêgerandina şiklê îzahê tune ye. Tuna ye, ji ber ku tecrûbeyên salan di wan de ev qabiliyet jî xwe ber pêş de biriyê. Di pirtûkê zarokan de xususiyetên şiklî yê pêwîst di ziman û uslûbê wan de bi hawakî wisa cîh girtîye ku, di pirtûkên xwe de ji bona vî serkeftinê, tiştêkî xusûtî û xebatek gelek zêde ne hewce ye êdî.

Ger wexta we hebe pirtûkên zarokan en ku nivîskarên pirtûkên zarokan nivîsandinê û yê ku ne nivîskarên pirtûkên zarokan nivîsandinê carê zimane wan bidin hember hev. Hûnê bibînin, ferqek gelek mezin di navberê de heye. Zimane Behrengî, yan jî yê Astrîd Lindgren bigrin dest. Sade, zelal, sivik, zimaneke heta tu bixwazî paqij. Sadetiya di zimên de, dibe ku bi hin rutûşan ber bi hev bibe, lê sivikiya (gotinên bi hêsariyê tê gotin û jî guh re xweş tê) zimên tu carî. Û baş e, gelo sîrrê vî serkeftinê çi ye? Bersîva me heta tu bixwazî vekirîye: Bes ji bo zarokan nivîsandinê elê bi tenê ji bo zarokan nivîsandin. Eger ku di warê edebiyata zarokan hûn bi îddiia ne û ger hûn dixwazin wê serkeftina bi dilê xwe bi dest xîwê demê bes ji bo zarokan binivîsin. Bes ji bo zarokan!

Ev maqale jî bal Z. Xamo ji Tirki hatîye wergerandin.

□ Mamostê me ye edeb carekê ji me re got: "Dema ez çûm welatekî Ewrûpî (wî ew welat binav kir, lê niha nawê bîra min) profesorê ku ez li cem bûbûm mêvan, min dawetî pêşangeha wêneyên hunermendên welatê xwe yê dema nuh kir. Em ji xalîçeyên hunermendekî diçûn yê din. Dawiya dawî xalîçekê bala min kişand, ez li ber rawestiyam û demêke dirêj lê temaşê kir. Bi xwe jî bilî tevlihevbûnê min tiştêkê de nedît. Di vî pêlê de mazûbanê min jî min re got: "Te dît... xweş temaşê bike... li vîna, li vî tiştê ku di nav siyê de binêre... Bala xwe bidê, ma ew ne wek însanekî ye? Dîsa min awirên xwe li xalîçeyê gerandin, tiştê ku min vî carê dît; reşîkek di reşîka siyê de bû..."

Li gor gotina mamoste wî dî re jî hevalê xwe re gotibû: "Gelo çîma emê li reşîkê însan bigerin? Çîma ewê ne bi gewd û qelafetê xwe li ber me be, daku em spehîbûn û mekrûhbûna wî bibînin... Divê hunermend rastiyê çî tal û çî şêrîn pêş meke..."

Heger ez peyva mamostê xwe bidomînim, ezê bêjim ku pîrsa diyarkirina rastiyê di jîyanê de di hunermendiyê de, tiştêkî ne pîr jî hev cuda ye û tevlihev e. Wîlo sînoren wê digihên hev, carna bi zehmetî meriv dikare wan ji hev derxe û nasbike. Lê çî di hunermendiyê de û çî di jîyanê de, divê însan di kirasê xwe de rûnê... Erê pêwîst e ew di kirasê xwe de be, çî ew nuh be û çî bi pine be... Tenê hînga emê li ber karekterên ku jî xurîstê û jîyanê hatine hunandin, bin. Ma jê bedewtir?

Di jîyanê de ez bi xwe rastiyê di vî bergê de min dîtibû de nabînim; rojekê li biblyoteka Stokholmê min merivêkî Kurd dît. Wî berguhkên teybê danîbû ber guhên xwe û musîkê dibihîst. Lê kîjan musîkê dibihîst bi xwe ez nizamî, lê bi bîhîstina xwe re awirên xwe wiha li hawirdora xwe digrand, mîna ku li hinekan bigere. Wî wîlo jî serê xwe li ber musîkê dihejand, daku kesê lê binêre bêje: "Ev camêrê ha jî tiştê tiştê ku dibihîze fam dike." Erê wî xortê Kurd li biblyoteka bajarê Ewrûpî serê xwe li ber musîkê dihejand, mîna ku extiyarên me li ber stranên dengbejan di odan de dihejandin. Tevî ku serhejandina xortê me ye nûhatî jî adeta bav û kalan hatiyê, lê baweriya min pê nehat û min xwe xapandinekê de dît. Çiqasî serhejandina li ber stranên dengbejan jî rastiyê û jî hinavê hatiyê, wiqasî jî ya xorto derew e û pa-yetîk, quretîyek vala ye...

Û tiştêkî din jî ew sekna bêmana ya li ber rohiyên ravestînokê. Bi xwe ez ne li dijî fêrbûna tiştên modern im. Lê belê ez nikarim betamiyê daqurtînim. Ez nikarim fam bikim, çilo merivê ku li welatê xwe heya duh mina çûkên çîkçikan li pêşiya tirimbêlan dixist û mîna marê teyar di nav wan de diçû dihat, îro li vîra şev nivê şevê bîyî tu ins û cîn hebin "Kurdê Stokholmî" li ber rohiya sor disekine û nameşê heya ku lampa kesk pênekeve. Di jîyana nuh de çiqasî ev tiştê ha ne li gora raman û daxwaza dilê wî mirovê rawestiyayî ye... Lewra ew wiha dike, ne ku ew dixwaze wiha bike...

Lê ew xwe wiha dide xwiyakirin, ji bo ku bibe wek hinekan... Lê ew jî bîr dike ku însan xweşik e, dema ew wek xwe be!!!

ARMANCÉ BIXWÎNE BIDE XWENDIN image of a book cover

Quncika tenduristî ne di ci de ye

Di jiyana çandeya gelê me de gavek nû

Jî afirandina Armancê re tê dayîn, bidin. Bi hêviya Serfiraziyê Mamostê Î. Jîndar/Sûriye

Jî ROJNAMA ARMANC RE

Armancê ji dil pîroz dikim. ŞAFAK GENÇLİK İstebol

Namên gihastî

Ez xwendevanekî Armancê me. Hejmarên 62 û 63, yê Kurdî derçûne gihîştin destê min. Ez bi derketina rojnama Armancê hemû bi Kurdî gelek kêfxweş bûm. Armanc di warê pêşvebirina çanda gelê Kurd de wê ciyek gelek giranbuha bigre. Ji bo jiyandina wê pêwîst e ku em xwendevan ji vezîfên xwe binin ci, ev jî bi, ji Armancê re nivîsandinê mimkûn e. Hevalên heja li gor baweriya min quncika tenduristî ne di ci de ye. Ji bo ku ew nivîsara piranî jî bi Kurdî ku li Ewrûpa dijîn hatiye nivîsandin. Tenê ji bo Kurdên ku li Ewrûpa dijîn nivîsandin jî ne di ci de ye. Nivîsên Armancê pêwîst e ku ji bo hemû Kurdan be. Bi dîtina min jî vî quncikê zêde bêhna Ewrûpatiyê tê. Ji dît tenduristî li vî quncikê tiştên dîtir bîn nivîsandin wê baştir be. Bi daxwazê serkeftinê.

Gelê Kurd, li dijî êrişên hov û har ên dijîmin hebûn û şerefa xwe ya netewî parastiyê û bi salan e, ku têkoşîna xwe ya serxwebûn û azadiyê dimeşîne. Ne metîngehkarî (kolonyalizm) û ne jî politîka hîndekarî ya asimilasyonîst nikarîbûye zimane me ye şêrîn Kurdî wenda bike. Armanc, bersîva vî ye. Bi nivîsandin û xwendina Kurdî em carek din dinamîti xînin bin himên politîka asimilasyonîst û nijadperest a dijîmin. Divê em zarokên xwe, neviyên xwe yê ku dahatîya me ne, bi nezaniya zimane zikmakî stûxwar nehêlin. Zarokên me roj bi roj divê bi hêztir bibin û bibin pisporên dehatî yê çande, ziman, pişê û dîrokê. Hûn kedkarên Rojnama Armancê di vî rê de tîrêjen hêviyê ne û ez çiqas spasî we bikim jî hindik e. Daxwaza min ji xwendevan ew e, ku bila jî Armancê re binivîsin. Divê em bi nivîsên xwe jiyana Armancê xurttir bikin û wê bighinin hemû kesan. Bi vî awayî em dê heqê keda ku

Ji redaksiyona "ARMANC" ra Hevalên heja, silaveka gerim. Ziman û çand di şerê miletê bindest da, cihekî giring û pîroz heye. Lewra cihê sanazîyê ye ku di vî dest û darê ku miletê Kurd tê da dibûrî û planên dijîmîna jî hemî lavya diênekirin, rojnameka serkeftî bi zimane Kurdî derkevît, nexasîme li Kurdistana Tirkiya dagirkirî, ku heta niho perdeka reş faşîstan hatiyê ser miletê Kurd û ziman û çand û gişt maf lê qedexa kiriye. Me bawerî heye ku "hemî tariya cihanê nikarî ronahiya fenerekî biveşêrît." Lê, cihe dilxweşiya me ye ku niho fener mîşe bûnye û ronahî li nav gişt layên welatê dagirkirî belabûye. Hîvidarin her serbilind bin û berefêşêye biçin. Em daxaza serkeftinê bû hewe dikeyin ji bo xizmeta ziman û çand a kûrdî. Bo pêşve û paşeroja geş li hîviya hewe ye. Xelî Dihokî Nivîskarekî Kurdistana Iraqê


Heta îro 63 hejmarên Armancê derketine, lêbelê hew yek tenê ketiyê destê min. Dema min Armanc xwend pir kêfa min hat. Bi rastî îro rojnama bi zimane kurmançî pir hewcî dike ku bê xwendin û di nav gelê me de bê belavkirin. Hinekê dî û bav jî nezani li dijî welatparêz û şoreşgera ne û nahêlin zarê wan pirtûk û korwara bixwînin. Çend roj berê dema ku Armanc ket mista min, mi jî diya xwe re jî çend ci xwend. Ji ber ku bi kurmançî hatibû nivîsandin wê jî jê fam kir û pir kêfa wê hat. Ji mir negot: ji bo çi tu vî rojnamê dixwîni? A ku ez bivêjim ew e: ji bo em fikrê xwe bi gelê xwe bidin qebûlkirin berî her tiştî gerek em zimane xwe baş bielimîn û bi zimane xwe bi gelê xwe re bipeyîvin. Piştî ku mi Armanc xwend ez li xwe hay bûm ku xwendina min bi kurmançî ber bi pêş dehere. Ez bawer dikim ku Armanc çiqasî bê xwendin, bi wê re ewê zimane me jî ber bi pêş here. Ji ber vî yekê ez Armanc û nivîskarên

Lî ser rûşşa gelê Kurd li Sûriyê jî binivîsin Hevalên heja, berrîsiyarên "Armanc"ê! Piştî silavên hevalbendî yê germ; Bê goman, ez gelek şabûm dema her du hejmarên Armancê (tîrmeh û tebaxê 1986) ketin destê min bi rêka hevalêkî ji Partiya Hevgirtina Gelêrî yê Kurdî li Sûriyê ye. Ez dikarim bêjim ku gava havalên YKDK biryar standine ku Armancê tenê bi zimane Kurdî û bi rengê nuh derxin, gavek gelek hêja ye û bi vî yekê hêviya hemû xwendevanên Kurd jî bi ci anîne. Hevalno! Dema min Armanc xwend min dît ku, axaftinê li ser rewşa gelê Kurd li Sûriyê tune, hêvidarim ku, ew kêmasî di hejmarên tenê de bi arîkariya rêxistinê Partiyên Kurdê Sûrî li Swêd yan li Ewrûpa rabe. Hevalno! Li dawî, silavên germ ên jî dilê min têne der, ji her karkerkî û nivîskarekî dixebite, ji bo pêşveçûna û serkeftina û azadiya gelê Kurd bi rê dikim. Hêvidarim, wê nişanên (şîart) Armancê: "Serxwebûn-Demokrasî-Sosyalizm" bi tevayî bi cih bîn.

Xwendevan gelek naman birêdikan ku tê de pîrozbahî û piştgirîya xwe diyardin, xeberên dora xwe dinivîsin yan jî doza abonetiya Armancê dikin. Em hemû naman dixwînin û li gor daxwazên wan çî lazîm be dikin, di weşandina rojnamê de gelek fêde ji van naman digirin. Lê gelek mixabin ku ciyê me têrê nake ku em hemû naman bi tevayî bîweşînin. Carna em hinekan kurd dikin diweşînin û hinekan jî qet nikarin biweşînin. Lê ji nîha pê ve namên ku werin çî bîweşandin jî çî neyên weşandin emê çî bidin navê xwediyê naman. Ev in hin navên ku name jî me re rêkîrine: Ji Hamburg, M. Elî, Rohat; ji Celle, Cotkar; ji A.Federal, M. Fattah, Remê Hemo; ji yûnanîstan, K. Kara; ji Yugoslavya-Sarajevo, Şivani K.; ji Erzurûmê, Sernas Farqîn; ji Hollanda, Bextiyar; ji Istenbol, Seyîd Xalid, Sortav; ji Qamişliyê, Koçer... ARMANC

NÜÇEYÊN DERVE

## Reagan; bazirganê xwînê



Dema rojnameyên Amerîkî eşkere kirin ku DAY çek firotiye Îranê, pêşî tu kesî bawer nekir. Reagan û hevalbendên wî yê li Xaniyê Sipî di destpêkê de bûyerê xwestin ku înkâr bikin. Lê belê dema bûyer bi dokuman, di rojnameyên Amerîkî de hat weşandin, ji Reagan re rê nema ku înkâr bike. Di 25'ê Çiriya Paşîn de R. Reagan beyan kir ku DAY ji Îranê re bi 40 mîlyon \$ çek firotiye.

Tê bîra xwendevanan jî, dema Şoreşa Îranê bi ser ket, Jimmy Carter (wê demê serokê DAY bû) emir da ku hemû ticaretên bi Îranê re bête rawestandin. Lê belê meha Gulana sala 1986'an R. Reagan vê qedexekirinê gav bi gav ji holê rakir û ji Îranê re çek firotin destpêkir.

Dema bûyer derket ortê Xaniyê Sipî têkilîhev bû. Wezîrê derve George Shultz, wezîrê parastinê Caspar Weinberger û serokê duemê DAY George Bush beyan kirin ku haya wan jî

vê ticaretê tuneye. Ronald Reagan jî beyan kir ku jê re derheq wê ticaretê tu agahdarî nehatiye dayîn. Lê belê eşkere bû ku Komîta Ewlekarî ya Netewî (NSC) ya DAY bi xwe ticaretê bi rê ve biriye. CIA jî alîkariya vê ticaretê kiriye. Îcar gelo kî jî R. Reagan, G. Shultz û G. Bush bawer dike. Her kes jî dizane ku CIA û NSC mecbûr in ku agahdarî bidine van kesan. Bud Mc Farlane yek ji kesên pir nêzî Reagan bi xwe çûye Îranê û ji çek firotinê re pêşengî kiriye. Li gor gotina Mc Farlane, hem Casper Weinberger û hem jî şefê CIA William Casey jî vî ticaretê agahdar bûn û ji bo transporta çekanan wan bi xwe emir dane.

Lê belê bûyer tenê bi tiştên jorin namîne. DAY kara ku ticaretê Îranê bi dest dixê dişîne ji Kontra re. Di vî bûyerê de jî NSC rolek girîng dileyze. Şefê NSC Amîral John Poindexter û endamê NSC'ê Oliver North kara firotina çekanan di-


nin ji Kontra re. Tiştê seyr li vir ev e ku Kongra DAY di wê demê de biryara qutkirina alîkariya Kontrayê stendibû. Bûyer bi vî jî namîne. Richard Secord ku danûstandinê wî ya pir germ bi George Bush re heye, bi xwe çûye Îranê û perên ku ji wê derê stendiye aniye teslîmî Kontraya kiriye. Çûn û hatina Richard Secord jî bi emrê Şefê NSC Amîral John Poindexter dibe.

Wek tê zanîn R. Reagan Îranê her tim bi "terorîstî" îtham dike. Danûstandina DAY a diplomatîkî jî zûve hatibû qutkirin û DAY dixwest welatên hevalbendên wê jî di rêçika wê de herin. Lê dema bûyerê çek firotinê derket holê, R. Reagan dest bi vir û derewan kir. Carek din xwest gelê DAY bixapîne. Lê piştî demê kurt Şefê NSC John Poindexter îstîfa xwe da û Oliver North jî ji NSC yê hat avêtin. Bi vî yekê jî carek din rûşesîya R. Reagan derket meydanê.

R. Reagan di civîna xwe ya ji bo rojnamevanan de beyan kir ku dixwaze rêkî ji dirustkirina danûstandina DAY û Îranê re bibîne. Lê belê daxwaz xilas kirina hin rehînen Amerîkî bû. R. Reagan bi vî yekê jî dixwest ku di hilbijartinan de serkevtinek bi dest xe.

Tiştêkî din jî heye ku pîrr entresan e. Di ticaretê çek firotinê de -hem jî Îranê re û hem jî ji Kontra re- Suudî Arabîstan û Îsraîl ku dijmîne hev in, hevkarî kirine. Dibe ku ji hin kesan re ev hevkarîya DAY, Îsraîl û Suudî Arabîstanê seyr be. Lê bi ya me tiştêkî normal e. Ji ber ku di şerê Iraq û Îranê de kara DAY jî alî firotina çekanan de pîrr e. Ji bo Suudî û Îsraîl jî domkirina şerê Îran û Iraqê tiştêkî baş e. Navbera Îsraîl û Iraqê û navbera Suudî û Îranê qet ne baş e. Zeifkirina wan her du dewletan menfeetek mezîn digihîne Îsraîl û Suudî Arabîstanê. Lê belê li vir para mezîn ji DAY re dikeve.

## Şer di navbera hêzên Filistînî û Lubnanî de



Li gor ajansên Cihanî leşkerên RRF (Rêxistina Rizgariya Filistînê) di navbera 24 û 25'ê çiriya paşîn de serketinek pîrr girîng bi dest xist û herêmek stratejîk jî destê Amal stend. RRF bi nêzî 1000 leşkerên xwe êrîş da ser gundê Mexduşek û gund bi temamî bi dest xist. Bi vî awayî RRF kontrola herêmeke fireh li başûrê Lubnanê jî bi dest xist.

Gundê Mexduşek li ser çiyayekî ye û ji alî stratejiyê ve ciyekî pîrr girîng e. Ji vî derê mirov dikare riya Beyrûdê, bajarê Eyn-al-Hilwê ku 30.000 Filistînî lê ciwarin kontrol bike. Mexduşek çend kilometir ji bajarê Seyda dûr e. Bi bidestxistina gundê Mexduşek RRF nêzî behrê jî bû.

Piştî vî biserketina RRF'ê Welîd Canbolat, Wezîrê Adaletê yê Lubnanê Nabîh Berrî (yek ji serokên Amal e) û Abdulhelîm Xeddâm li Şamê civînek çêkirin. We-

lîd Canbolat got ku hêzên wî wê li dij RRF bi Amal re têkeve tevgerê.

Ev çend hefte ye ku DAY û hevalbendên wê yê li Ewropa jî bo ku bikaribin êrîş bin ser Suriyeyê dest bi propaganda kirine û DAY hêzên xwe yê li Derya Sipî xistiye alarmê, tatbîkatan çêdike. Almanya Federal diplomatên Sûriyê bi terorîstî îtham kir û derçûna wan daxwaz kir. Ji aliyê din jî Îsraîl jî bo ku li dij hêzên dijî emperyalîzm û siyonîzmê muxalefet biafirîne çî ji dest tê dike.

Di vî rewşê de diviya bû hamû hêzên li dij emperyalîzm û siyonîzmê bi hev re hevkarîyê çêkire, yekbûna. Lê mixabin bi eks dibe û hêzên li dij emperyalîzm û siyonîzmê bi hev dikevin û bi vî kirinê jî li hember dijmin qels dikevin.

## NATO DÛBEZÎNE

Mesrefa leşkerî ya NATO'yê sal bi sal bi gavên mezîn zêde dibe.

Li gor Enstîtuya Lêkolîna Aştiya Navnetewî ya Swêdê (SIPRI) mesrefa leşkerî ya NATO yê ji bo sala 1985'an gihîştîye 327.680 mîlyar \$.

Ev reqem % 49,4'ê mesrefa leşkerî ya hemû dinê ye. Mesrefa WTO (Pakta Warşova) jî 160.132 mîlyar \$ bû û ev reqem % 24,1'ê mesrefa leşkerî ya hemû dinê ye. Mesrefa leşkerî ya NATO ya sala 1984'an 308.124 mîlyar \$ ya WTO jî 155.303 mîlyar \$ bû. Ku mirov reqeman bine ber hev dibîne ku NATO mesrefa xwe ya leşkerî di salekê de nêzî 19,5 mîlyar \$ û WTO jî nêzî 5 mîlyar \$ zêde kiriye.

Reqemên sala 1980 jî bo NATO 256.301 mîlyar \$ û jî bo WTO 144.279 mîlyar \$ bûn. NATO jî sala 1980 heya 1985'an mesrefa xwe ya leşkerî 71.379 mîlyar \$ û WTO jî 11.024 mîlyar \$ zêde kiriye. Ev tê wê manê ku NATO jî WTO nêzî 6,5 car zêde mesrefa leşkerî kiriye.

Ji van reqemên jorin jî xuya ye ku yê ku aştiyê dixê nav xeterê NATO ye. Eger mirov mesrefa leşkerî yê welatên ku ne endamên NATO ne lê belê hevalbend wê ne hesab bikin ferqa zêdebûna her du alîyan dê wê pirtir be.

Îcar ne hewceye ku mirov gotarek dirêj li ser vî babetê binivise. NATO bi pêşengîya DAY her roj diqire û dibêje, yê ku aştiya dinê dixê xeterê ne NATO lê WTO ye. Lê belê gotin û kirinên DAY û NATO yê li hev nagirin. Reqemên jorin jî vîya îsbat dikin. Ne metelok dibêje: "Gundê xuya jê re rêber navê".

MIRÊKA

LATÎN AMERÎKA  
TALAN Û BUHRANA ABORÎ

25 netewên Latîn Amerîka û Karaîbî ku endamên IDB ê (Inter-American Development Bank) ne, di sala 1985'an de nêzî 36,679 mîlyar \$ dane der.

Li gor lêkolîna IDB ê ev tê wê manê ku ji sala 1982'an heya sala 1985'an bi tevî faîznan 100 mîlyar \$ derketiye der.

Di sala li gor vî lêkolîna IDB her çiqas "di van salên dawî de ji vî herêmê perekî mezîn û bê nabêyn derketiye der jî" deynê van welatan jî sala 1981'ê û vir de % 9 zêde bûye û gihîştîye 361 mîlyar \$.

Van welatan îtxalatên xwe 1/3 û mesrefên civakî yê hun-dirê welat jî % 27 kêmkirine.

HATINA KU PARA MIROVEKÎ  
DÛKEVE KÛM DÛBE

Ji bilî Brezîlyayê ku li wê derê sala 1985'an hatina ku serê mirovekî dikeve % 8 zêde bû, pêşdeçûn bi gelemperî di hemû herêmê de % 1 kêmkirine.

Hilberîna ku para mirovekî dikeve, di nivê welatên endamê IDB ê de ji zêdeyî % 50 kêmkirine û ev reqem jî bo 25 welatan jî sala 1980 û vir de % 8 e.

Hatina ku para mirovekî dikeve di 10 welatan de % 10 û 7 welatên (Bolîvya, Venezuela, Guatemala, Guyana, Arjantin, Uruguay û El Salvador) din de % 15 kêmkirine.

Li gor rapora IDB ê salên 80'yî jî welatên wekî Bolîvya, Haîtî, Guatemala, Honduras û Venezuela re bûye "domandina daketina seviya jiyanê".

Di sala IDB nîşan dide, ku hejmara bêkarî ya navbera ya sala 1980 û 1984'an nehatiye guhartin û di sala 1985'an de jî bêkarî wek navbera sala 1980 û 1984'an mezîn bûye û % 30 kesên ku di bajaran de xwedî kar bûne bi temamî kar nekiri-ne.

## TASARUF

Rapora IDB ê endîşa xwe jî bo kêmkirina mesrefên civakî ku ji sala 1982'an û vir de ji bo afirandina îstîkharê hatibû kirin, nîşan dide. Tasarufên ku ji avahiyên civakî hatibûn kirin jî bo deynê derve bûn.

Netîca vî siyasatê tesîrek ne baş li parvekirina hatina mirov dike. Tenê bi vî namîne, pêşdeçûna avahiyên civakî jî jî vî siyasatê zirar dibîne. Avahiyên tendurîstî û hindekariyê jî jî dewletê zêde alîkarî nastîne.

Li gor rapora sala 1985'an tu tişt tune ku mirov jê kêfxweş bibe. Hatina jî ticaretê derve di sala 1985'an de 37 mîlyar \$ bû. Ev hatin di sala 1985'an de kete 33 mîlyar \$. Di vî demê de qeweta kirinê û îxracatê jî % 6,6 daket jêr.

Ferqa îxracat û îtxalatê di sala 1985'an de bû 4 mîlyar \$ û ev reqem 2 qat li gor sala 1984'an zêde ye.

Li gor texmînan pêşdeçûna endustriya manîfaktor di sala 1985'an de li dor % 4,8 ma. Sala berê jî pêşdeçûn % 4,8 bû. Ev tê wê manê ku tu pêşdeçûn nebûye û di ser de jî bikarîna enerjîyê parîyek zêde bûye.

Di rapora IDB ê de bi kurtayî tê gotin, ku aboriya Latîn Amerîka bi awakî pîrr talûke paşde diçe deynê der jî roj bi roj zêde dibe û dibe serkaniya "endîşek ciddî".

Ji Presa Latîna  
Wergêr: H. Mizgîn

## SOSYALÎZMA REEL

## Li Sovyet Ilim û teknîk pêşve diçe

Yekîtiya Sovyet dewletek endustrî ya mezîn e. Di 10 salên dawî de Fona Berhembêdana Himî (Fona Întaca Esasî) 2 qat zêde bûye û gihîştîye ser trîliyonek rûble. Yekîtiya Sovyet di hesinê xav û hesinê helandî, pola, traktor û çêkirina lokomotîfên elektrîkî de di cihanê de yekem e.

Di vî pêşketinê de ilim rolek mezîn dilîze. Ji 5000'an zêdetir enstîtû, 900 zaningeh û bi hezaran teşkilatên projê di ilim û teknîk de lêkolînek mezîn dimeşînin.

Di teoriya fizîka atomî, plazma, biyolojiya molekûl û di hêla genetîkê de sewiya van xebaran gelek bilind e. Di vî hêlê de xebara zanîngeha matematîkê di cihanê de bi nav û deng e.

Di cihanê de yekemîn car santrala elektrîkî ya atomî di Yekîtiya Sovyet de avabûye. Cara pêşîn atoma çêşemikandinê destpêkîriye û jî bo avakirina enerjîya termonukleer bîngeh hatîye avêtin.

Serfiraziya ilim û teknîk wextê di pratîkê de bi cih bûye, di warê aborî de jî fêdek mezîn hatîye holê. Hem kalîta tiştan bilind bûye û dibe, hem jî karkir jî karên giran serbest dibin.

Yekîtiya Sovyet, di îcadên nû de di cihanê de yekem e. Tenê di navbera salên 1976-1980'î de 380.000 îcad çêbûne. Ev îcad, jî aboriya gel re 8 mîlyar rûble zêdetir fêde bi cih aniye.



# Hevkariya Civaka Ermeniya û Kurda

KARLANE ÇAÇANI

-6-



"Sala 1915'a, wextê hukûmeta Tirkîyê dest bi qirkirina Ermeniya kir -dibêje di bîranînên xwe de Nûrî Hîzani- Murtele Begê gelek Ermeniyên qeza Çataxê, Hîzanê, Berwariyê di nav Kurdên qeza xwe de xwedî kir, heta qetlîam xelas bû, careke din bi qedir û hurmet wan verêkir welatê wan."

Di derheq peywendiyên Ermenî û Kurdên qeza Mukşê de her wiha binelîyê wê qezê Ameksan Darbiryar ji wiha dibêje; "Nîvê gundên qeza Mukşê Kurd bûn, nîvî ji Ermenî. Kurd û Ermeniyên wê qezê ji hev re wekî bira bûn." (29) Di qeza Mukşê de wekî dîrok ji dide xuyakirin, Kurd Ermenî ji hev re wekî bira bûne, di rojên qewmandinê giran de alîkarî dane hevûdu, pêk ve li hember destdirêjayiya hukûmeta Tirkîyê şer kirine. Bineliyê gundê Haxîne yê qeza Mukşê Kazaryan Garegn, ê ku niha li bajarê Stapanovanê ye, di derheq vî dostaniyê de wiha dibêje; "Hema di gundê Haxîne de Murtele Beg dima, ew merivêkî bê hempa bû, dostê Ermenyan ê herî nêzik bû, wî tu ferqî nedixist nabêna Ermeniya û Kurda, bi destê wî bi hezaran Ermenî ji qirkirina Tirkîyê xelas bûne. Ew xwediyê me bû, deriyê wî li ber me her Ermenîkî vekirî bû. Sala 1915'a gava hukûmeta Tirkîyê dest bi qirkirina Ermeniya ya dudu kir, ez deh salî bûm; rind tê bîra min Wextê Murtele Begê seh kir, ku eskerê Tirkîya wê bê Mukşê, emir da, ku Kurd hemû Ermeniyên bi salên xwe ve mezîni li nava devî û şikefta, di çiya de xwedî kin, lê zarokên Ermeniya bibin di malên xwe de xwedîkin,"

nehêlin ku eskerê Tirkîyan dest bidin wan. Min jî bir mala Apê Mîsto. Gava eskerên Tirkîyan ket gundê me, hatin li mala Mîsto jî nihêrin, çika Ermenî hene yan na. Wê çaxê diya Mîsto li ber tendûrê çokdayî nan dipaht. Pêre-pêre ez kirim bin pêşa xwe û refika nan jî da ber min jî bo ku neyem kîfşîkin. A wiha ez û hezaran zarokên wekî min jî qirkirînek xelas bûn."

Kurdzanê naskirî, akademîk Orbeli jî bi qedirgiraniyeke mezîni di derheq Murtele Begê û dostaniya Ermenî û Kurdên qeza Mukşê de xebir dide. Ew, sala 1911'a jî bal Akademiya Zanistî ya Hukûmeta Rusya diçe Wanê jî bo ku nasîna xwe bide zaravê Ermeniya yê qeza Mukşê, gramatik û xebirname Kurdî hazir bike. Bi wê niyetê, ew du caran diçe Mukşê, tevli kufleta xwe çend mehan li mala Murtele Begê ku hemû mecala xwe saz dike da Orbeli bi serfirazî xebata xwe xelas bike. H. A. Orbeli dinivîse; "Ku di qeza Mukşê de bi saya Murtele Begê, Kurd û Ermenî weke birayên hev bûn." (31)

Dewsgirtiye balyozê (sefîrê) Rusya yê li Tirkîyê S. Olferev ku li Wanê rûdînîşt, di derheq Murtele Begê de dinivîse; "Murtele Beg merivêkî bi her awayî cuda ye. Merivê wekî wî bi marîfet, rehîm û bi aqil tune. Ew gelekî rind bi zîmanê Ermenî xebir dide, bi hub û hizîkirînek mezîni ve ber bi Ermenyan ve dibe. Wextê li qeza Wanê dest bi qirkirina Ermeniya bû, ji bo Ermenî jî wê qirkirînek bêne xelaskirin wî hemû mecal dan sazîkirînek. Di herêma wî de tu Ermenîkî ziyar nedît." (32)

Murtele Begê Mukşê, her usa bi qedirgiraniyeke mezîni ber bi Rusya

de dibû, li ser wê fikrê bû, ku civaka Kurda bes bi destê Rusya azadiya xwe bistîne, loma jî roj bi roj li hêviya wê yekê bû. Ew gelekî bi balyozxana Rusya ya li Wanê ve hatibû girêdanê, şewr û mişewra xwe bi S. Olferev re derbas dikir.

Wê yeka han gelekî baş ji nama S. Olferev ya ji balyozê Rusya yê li Îstanbul re şandibû dihat xuyakirin. Nivîsibû ku; "Çendêkî berî niha, Midûrê Mukşê Murtele Beg hatibû Wanê. Walî bi hîlekarîke mezîni wî qebûl kir û jê re got; "Ne ku ez tenê, balyozê Rusya jî qedrê te bilind digre û bi lavaya balyozê Üris min pîrs pêşde kişandiyê, ku te bi nişana Tirkîyê rawestî." Lê Murtele Beg, arzuhal dabû walî, da ku jî ber nexweşiya wî jî xebatê aza bikin. Walî hat cem min, vê yekê jî min re qal kir. Min şewr da walî, da ku vî Kurdê bi marîfet bi qeymeqamî tayîni bike qeza Nordûzê. Walî pê qayil bû û hema wê rojê haya Murtele Begê bi vî yekê xist. Lê Murtele Beg bi vî yekê jî qayil nebû. Ew hat cem min û me rû bi rû gelekî bi hev re qise kir. Wî jî min re got, ku; "Ez tu carî nêzîkbûna we ya bi vî awayî jî dil, ji bîr nakim. Ez tu caran nêzikvanêd xwe, bi tiştêkî hesab nakim, lê gelekî ji dewsgirtiye Balyozê Rûs razî me. Ji bo vî yekê jî ez hemû pêşniyariyên Walî red dikim, çimkî rind zanim, ku dahatîya hukûmetê pûç e. Di Tirkîyê de malxwe tune, şuxul geleki hukûmetê re nayne. Wê çî biqewazîme ez nizanim, lê ez bi xwe dixwazim, ku zûtîrekê Rûs bikeve Kurdîstanê. Ez xayîntiyê bi hukûmetê re nakim, lê wextê ez dibînim hukûmet bêserî ye û tune."

wê çaxê jî bo civaka min a ezîz a Kurd ez xofê dikşînim. Malxwe me, perê me tune û ya sereke ew e, ku îzn û ruxseta me ji tune. Min biryar daye, ku destê xwe ji Mukşê bikşînim û herim Tîflîsê, heger jî min re li hev neyê ku heta dawîya jiyana xwe li wir bimînim, qe ne salekê li wir bim. Ezê pêsiyê li cem dostê xwe yê Orbeli û Lalaryans bimînim..." (33)

Di qeza Basenê de jî, ya ku li aliye rohilatê Erzürûmê bû, Ermenî û Kurda her tim bi hev re dostanî kirine, gelek caran pêkve li hemberî dijîminê xwe şer kirine, şîr û şayiya hevdu pîrsîne.

Berî şerê cîhanê yê yekemîn, li Basenê 46.654 meriv hebûne, ji van 20 hezar Ermenî bûn, ên mayîni Kurd, Hûn û Tirkî bûn (34). Li vir qasî gundên Ermenyan gundên Kurda jî hebûn, danîştwanên wan tu ferqî nedixistin nabêna hevdu, bi hev re weke qewmekî û dost bûn. A here berbîçav ew bû, ku gundiyan Kurd û Ermenî, wextê nandirûnê, çandinê, benderan dihatin alîkariya hevûdu (35). Wekî danîştwanê Basenê; G. Hakobyani dibêje; "Wextê li Basenê Jêrin, zivistan û payîzan dawet çêdibûn, ew dawetana beyî Kurda nedihatîni kirin. Kurd ne ku tenê bi dil û can diçûn dawetên Ermenyan, hê di ser de wek pêşkêşî pezdibîrin." (36)

(Dom dlke)

## Bîranînên Generalekî Tirk

Cemal Madanoğlu Wergêr: Alîşêr

-6-

Wextê me bi Şexmus re diaxift, di sa ereba reşî a nêzî hêşinê tari ù kelekî, got wûdû û di rexê me re derbasbû. Vê carê min bi diqet lê nêrî, di hindur de serbazekî xortîni rûdine.

-Ew mirovê ku hun jê re Alfons dibêjin ev e? Me bi axiftinê êvar anîbû.

Roj tari dibe.

Ethem:

-De em herin...

-Em bi ku de herin?

-Vê êvarê ezê bi te ereqekê bidim vexarin...

Em çûn û me dît.

Vê carê di binîya me re Dicle diherike.

Li ser sîngan meyhanek...

Serbaz mase bi mase rûniştine.

Li ser masekî jî em rûniştin.

Me ereq da anîn.

Ez ê taxîma tîfingên makîne ji Ethem teslîm bigirim. Me dest bi vexwarînê kir. Lê di mejiyê min de pîrsêk heye, bi tu awayî ez nikarim bersiva wê bidim.

Min ji Ethem pîrsî:

— De lo, ji bo çî Yuzbaşî Celal ji min re got, dê tu taxîma xwe "bibînî û bi çavên xwe lê bînerî û bi wî awayî teslîm bigirî."

Ethem qedeha xwe rakir:

— Dê ji bo şerefa te...

Em vedixwin.

Lê ez diçim û tîm, tîme ser vî mijarê, lê ew fetlan dide xwe û bersiva nade.

Pîştî qedeha çaran zîmanê wî vebû.

Mana wezîfe girtin a bi dîtin û bi çavên xwe lê nihêrtin ev e: Ji vir wêde, ciyek heye jê re Silopî tê gotin. Yek ji bolûkên tabûrê li wir e. Serbazê ku tê, ji vir dişînin wir. Salek li Silopî dimîne. Niha du tîfingên te ên bi makîne hene. Ji tîfingên yek li vir e; ya din jî ji bo mildana ber bolûka Silopî hatîye şandin. Silopî ciyekî gelek xirab e. Dê tu herî wir û taxîma xwe teslîm bigirî... Lê, serbazê Silopiyê sala par hatîye şandin. Wextê tu ber bi çûnê bî bang wî dikin. Lê wextê tu herî wir, tu nikarî bi wî re rû bi rû bimînî; ji ber ku ew di riya çiyê de tî vir... Wextê tu herî wir, tu li wir serbaz nabînî. Hatîna serbazê Silopiyê ya vir, bi telefonê xebir didin te. Tabur jî emrek dide te, dibê; tu heta xebira dawiyê ku em ji te re bişînin fermandarê bolûkê yî, dê tu li wir bimînî heta sala bê... Sala bê, yek din tê, bi eynî formûlê diguherîn.

Wextê min guhê xwe da van, min xwe bi xwe:

— Wayyyy... got.

Ango niyeta min çî bû? Madem ez hatim tabûra sînorê, hinek armancên min hene. Li vir wek Nîgdê tedbîrekî bi tund tune. Tiştê ku min xist mejiyê xwe ev e: Dê kitêb bixwînim. Dê ji bo îmtîhana Akademiya Şerê bixebitim. Sebebê bazdana min ji Mêrdînê jî ev bû. Li Mêrdînê min serbazekî dîtibû. Li gor qîsekirina wî, li Mêrdînê bolûkê a tedbîrxanê hebûye, fermanber xwestiye min bide serokatîya wê bolûkê. Wextê min ewa han bihist, ez du roj li Mêrdînê mam, pişt re min fetil da xwe ji wir bazda. Ji ber ku tedbîr, tedbîr, dê wextê xebata xwendîni jî min re nehêle. Niha jî vî karê Silopiyê derket pêşiya min...

Bihna min teng dibe.

Em vedixwin.

Dom dlke

22,1 X 34 cm. bûye, hejmara 14'an ne tê de (ku ew 4 rûpel bûye), hemû hejmarên dinê 6 rûpel bûne.

Hêjayî gotinê ye, Mîstefa Paşayê Yamulkî di destpêka sala 1926'an de, her bi navê Bangî Kurdistan 3 hejmarên dinê weşandine, ku li ser wan nivîsandîye 14-1, 14-2, 14-3. Di van de Mîstefa Şewqî nivîskar û Kerîm Rûstem jî kargerîni wê bûye.

\*Zemanê gurza çû, pihewan êdî ilm e Çekê dest e sen'et, sengera rim û tîrê ilm e  
Rojnameke ilmî, civakî, edebî, hur û serbest a millî ye, ji heftê carekê derdikeve.

\*\*Mesrefa çapkirinê û h.w.d. a yekemîn hejmara wê rojname jî bal endamên damîni yê Komela Kurdistanê hatîye temînkirin û vî hejmara han a yekemîn, em teberru dikin û bê pere belav û pêşkêşî birayêni welatparêz dikin.

\*\*\*Es-selam û aleykum gelî Kurda, netewa kevnareyî Pehlêwî, guhê xwe bidin Bangî Kurdistan, ev bang jî bo agahdariya hemû Kurda e, ji bo hişyariya şeran e, ji bo sehkirina bav û dayîkan e, guhên xwe bidin vî bangê çî tî de heye, ev hawara han jî bo çî ye, bes in axaftinê pûç û vala yêni kolanan û derew û kurepis, li çîhanê binêrin di warê sen'et û me'rifet de ji me paşkevîtiyê kî heye? Starek me tune ye ku em pê setra pîrekên xwe bikin, ta û derzi-

yek me jî nine ku li welatê me hatibe çêkirin, nişana mezinahî û xanedaniyê niha ji şekirî û çayê îbarete e, evên han jî di Kurdistanê de ninîn, ji çiyên dîr tînin anîn. Perçe kaxizek ku ji bo nivîştî çavên şerîni be ew jî ji Freneyê tî, jî sedî çar di nav me de ninîn ku kaxizek ji bo kes û kar û dostekî xweyî weşartî ji ailla xwe re binivîse. Egel û mêzerên me jî Îran û Freneyê û mezînen (hoqqe-vefî) jî Hindîstanê û eba me ya mezîna a nazdar jî Ereban, kefenên miriyên me jî Ewropa û pêçekên zarokên me jî Amerîkayê tîni.

### ÇAVKANÎ

- 1-Kurd Kadînlari Cemiyeti (Komela Jinên Kurd)
- 2-Bînere: Refîk Hilmî, Yadaşt (Bîranîn), Cildê 2-beşê yekem, Bexdad 1956, rûpel: 28
- 3-Bînere: Bangî Kurdistan, Silêymanî hejmar 1, 2'ye Tebaxa 1922, rûpel: 1-2.
- 4-Hêjayî gotinê ye ku Mamoste Refîk Hilmî di bîranînên xwe de tenê navê xwe jî endamên hilbijartî nivîstîye (Refîk Hilmî, Yadaşt Qismê 5'an, Bexdad 1957, rûpel: 486-487)
- 4-Bînere: Wena li ser muhra Komela Kurdistan, di rûpelê 404'ê hejmara kovara Korî Zaryaryî Kurd (Akademiya ilmî ya Kurd)
- 5-Bangî Kurdistan.
- 6-Dest bi guhertîna nivîsandinê nehatîye dan.
- 7-Kak Cemal Xeznedar karekî gelek baş kir ku wênayê hejmarên van rojnaman belav kirîye, bi vî awayî bûye serokaniyekî li ber destê biyaniyan (Bînere: Bangî Kurdistan berhevkirina li ser nivîsandinê Cemal Xeznedar, Bexdad 1974).

## LÊKOLÎN û ENCAM

### MUHR û ORGANA KOMELA KURDISTAN

Dr. Kemal Mazhar

Di destpêka sedsala 20'an de û bi taybetî piştî serkevtîna Şoreşa sala 1908'an a Tirkên Cîwan, ku text û taca Sultan Ebdulmehîdê zîrdar ji bin hat kişandin, rawesherbirên Kurd li Îstanbul û Diyarbekrê ketin nav damezirandîna komel û rêxistinên serbixwe; wek Komela Kurdistan (Kurdistan Cemiyeti), Komela Giştî ya Rewşenbîrî û Weşanî ya Kurd (Kürt Te'âmîmi Maarif ve Neşriyat cem'iyeti), Komela Bilindbûna Kurdistan (Kurdistan Teali Cemiyeti) û h.w.d. Di wan wextan de, her wiha jinên Kurd jî ber bi hişyariya xwe ve çûn û rêxistin nehatibûn avakirin. Roleke gelek mezîni a van komelan di tevgera neteweyî û di jiyana rawesherbirî ya gelê Kurd de hebû.

Li Kurdistana îraqê, Ji ber ku heta dawîya Şerê Yekem ê Cîhanê tu komel û rêxistin nehatibûn avakirin. Eşkere bû ku gelê Kurd kete nav xebatek asê û dîr-dirêj li dijî Îngilîzê dagirker. Di warê vî xebatê de grubek ji rawesherbirên vî perçê han ê Kurdistanê, di girîngî û qîmetê komel û rêxistinên a jî bo ku di jiyana gel de biwayê xwe bigirin, gîhaştin. Bi vî awayî di salên 20'an de, di vî perçê de jî dest hat avêtin ji bo damezirandîna çend komel û rêxistinên. Mamoste Refîk Hilmî di vî warî de nivîsandîye ku:

"Ji bal welatparêzên Kurd... her rojê komelek dihat damezirandin" (2). Komelên siyasî yêni Kurdistana Îraqê di wê qonaxê de feydeke

mezîni ji serpêhatiyên komel û rêxistinên siyasî yêni Kurdistana Tirkîyê wergirtin. Ji ber ku bi taybetî beşek ji damezrêneran û endamên aktif berî xelasbûna Şerê Cîhanê yê Yekem li Îstanbul xwendibûn û kar kiribûn.

Yek ji wan komelên ku di destpêka salên 20'an de li Kurdistana Îraqê hatîni damezirandin, Komela Kurdistan (Cemiyetî Kurdistan) bû. Ev komela han yekem rêxistin a eşkere bû di dîroka Kurdistana Îraqê de, ku karbidestên Îngilîzan jî ber gelek sebebên naçar man riya xebatê bidînê.

Komela Kurdistan, li bajarê Silêmaniye, roja îna 21'ê Tirmeha sala 1922'yan di civînekê mezîni a di mizgefta Seyîd Hesenê Mufîdî de, di bin seroktiya Mîstefa Paşa Yamulkî de hat damezirandin. Di riya dengdana nehêni de; Refîk Hilmî, Ehmed Begê Tewfîk Beg, Salihî Qaftan, Faîk Begê Marûf Beg, Hacî Axayê Fethullah, Îzzet Begê Osman Paşa, Ethem Efendî, Ehmed Behcet, Şêx Mihemedê Gulanî, Şêx Eliyê Serkar, Eliyê Bapîr Axa, Abdullah Efendiyê Mihe-med Efendî û Şukrî Heleke jî bo birêvebirin û organên Komelê hatin hilbijartin (3).

Muhra Komela Kurdistanê ya taybetî hebû û li ser wiha hatibû nivîsandin: **Cem'iye'tî Kurdistan**. Li ser rûyê navê jî wêna rojê hebûye (4). Ev muhra han jî aliye -xwelixweş- Ebdulwezîzê kurê Mîstefa Paşa ve hatîye parastin.

Her di wê wextê de Komela Kurdistan, biryar da organeke hefteyî bi navê **Bangî Kurdistan** (5)

derxe, ku yekemîn hejmara wê rojê Çarşemba 8'ê Zulhecceya 1340'ê hicrî -2'yê sala 1922 yê Îsayî- li Silêmaniyê hatîye çapkirin. Li ser hejmara pêşî ya Bangî Kurdistan wiha hatîye nivîsandin:

"**Xwedî û Midurê Berpîrsiyar Mîstefa Paşa, nivîsaranê Kurdî û Farisî Elî Kemal û M. Nârî, nivîsaranê Tirkî Refîk Hilmî.**"

Di bin navê rojnamê de jî ewa han hatîye nivîsandin:

"**Zemanî gurz û rim rabird û êsta palewan ilm e.**

**Sûlahî dest e sin'et, barîqeyî tîx û sinan ilm e.**

**ilmî, içtîma'î, edebî, xezeteyekî hur û serbestî millî ye, heweyî carekê derdîçê"** (6)\*.

Ji derveyî yêni ku bi armancên taybetî hatîni derêxistin û rolek kevnepiristî lîstine, hemû rûpelên dîroka rojnamenivîsî ya Kurdî ciyê şanaziyê ne, her çî çax gelek rojname yan kovarên Kurdî zor bi dest dikevin jî. Wek belge, li vir bi bê destlêdan mîsalek biçûk ji Bangî Kurdistan emê bidin. Li ser rûpelê 3'yan ê vî rojnamê ewa han hatîye nivîsandin:

"**Mesrefî çapîkîrdin v.s. yî ewel nusxeyî em gazeteyê le tereftî e'zanî dai'miyî Cem'iye'tî Kurdistane-ve te'mîn kirawe we em ewel nusxeyî teberrukekîyn we mecane (belaş) tewzî i we teqdîmî biraderanî wetenî dekrêy'**" \*\*

Di eynî hejmarê de bi navê xwedî Mîrlîva Mîstefa, ewa han hatîye belavkirin, ku jî ber giranbuhayiya wê bi bê destlêdan em pêşkêşî xwendevanan dikin:

"**Es-selam û aleykum ya Kur-**

*dan, ey qewmî qedîmî Pehlêwî, goybigirin le Bangî Kurdistan, em bange bo xebardarî hemû Kurda e, bo wusyariyî şeran e, bo bihîstîni bawk we daykan e, goybigirin em bange çî tî de ye, em haware bo çî ye, qiseyî pir û pûçî kolanan, dîrew helbestîni rêjgawan bes e, temaşeyî alem biken le sen'et û me'rifet da le ême paşkevîtiyê kî heye? Kalayekîman niye bo setrî hewretman kaftî bê, derzî we dazuyekî man niye ke destkirdê welatman bê, nişaneyî ezamet û xanedanîşî ke êste îbarete le şekr û çay ewaneş hê Kurdistan niyn, le cigeyan dîr dêtin. Parçe kaxeziyek ke bo nuştêyê çewro şerîni bê, ewîşî le Frengîstanewê dêt, le seda çîwarman tî da niye ke kaxeziyek bo kesukarî we sirreki mehrmane bo aileyê xoy binûsî. Mişkey mîzerman le İran û Frengîstan we gorunê gul hoqqeyî man le Hindîstan we eba-yê gewre nazdaranman le Erebanîtan we kifnê mîrdûwanman le Ewropa we malukeyî mindalanman le Emerîkawê bo dêt'"\*\**

Hejmarên Bangî Kurdistan bi piranî jî xeber, gotin û gotarên girîngî pêk dihatin. Bê guman belgên bi qîmet bûn ji bo ronîkirina gelek aliyên dîroka nû û hemdemî ya netewa Kurd (7).

Bangî Kurdistan li Silêmaniyê derçuyî û 14 hejmar jê hatîye weşandin û di tevan de, li ser rûpelê dawiyê rojnamê hatîye nivîsandin, ku **li Çapxana Hukûmetê li Silêmani** hatîye çapkirin.

Roja weşandinê hejmara 14'an a Bangî Kurdistan 8'ê Hezîrana sala 1923 yê, pîvana hemû hejmaran

ÇIROK

**Nivîskar:** İvan Vazov  
**Wergêr:** Elîkan

Wê payiza çûyî çî mij û dumaneke gelek kor xwe berdabû ser gundê Vetre! Şilî û şopî bû; baranek hûr dibariya, te digo qey esman heliyabû û bûbû tebeqên ewrê qerîsî û cemidî, ên ku xêniyên gund ên nizmik sewaxkiribûn. Kuça tev bi herî, ji qeflên mirovan tijî bû. Kuça navbera herdu xanan jî ji faytona, ji erêbên ga yên barkirî bi cebirxanan jî gundî, efsere (zabit) û ji deweran gişt dagirtî bû. Ewên hêja nu diçûn eskeriyê di nava qerbalixê de derbas dibûn. Hinêk jî wan qapûtên eskeriyê li xwe kiribûn, hinêkan jî abayên xwe vajî avêtibûn ser milê xwe, piraniya wan mersikên xwe î kevn di dewsa qapûtê baranê de li xwe kiribûn, çaroxên di lingên wan de tijî av bûbûn, singên wan ji rext û fişekan xemlandî bûn, tûrikên heya di dev re tijî li milê wan bûn, tivingên wan î ji çiqê dara kevot xemlandî li milê wan bûn... Serma bû, herî (çamûr) digihişt heya çoka, berf û baran bi hevra dibarî, felaketek bû, lê wan dilok digotin û distran... "Peçenekên" bikêr bûn! Ji eskerê Rûmeliyan re digotin "Peçenek".

Li ber derê hinêk sitwan, rêwîngê û gundî bi ecebmayî û meraq li xortên şilbûyî mêzidikirin.

Li ber xana navîn, qefle bi qefle pîrek, keçên xame û zarokên kincên wan qetiyayî yên ji serma diricifin û lev û rûyên wan ji serma reş û şînbuyî, xwe rêzkiribûn. Gel hatibû pêşiya eskerên ji Vetre, ên ku di nava alayci Xarmanlî de çûbûn liqê Xarmanlî ji bo li dijî Tirka şerbikin û vê carê wê herin Sofiya û ji wir jî herin qada şer -li dijî Yugoslaviya. Hatibûn ji wan re bi temamî bêjin "oxir be".

-Ha binêr, lawê Gergê wa ye! Tsiyatko, oxir be!  
-Binêr, ka binêr, Rangel derbas dibe.

-Ha ji ter, lawê Nedelkin! İvanko, va dayika te li vir e! Û edî dest dirêjbûn, û li ser hinarikên rûyan randik dixulxin û çend bêjên nivcoke bi hev dihatin guhastin... Lê belê çiqas diçû esker dîr dibûn, dîr dibûn.

-Dayê, birakê min wa ye!, digot. Keçikeye kekî a ku hinarikên ruyê wê sorbûyî.

-Keko Stoyanko! digot bi qî-jin zarokeke heşt salî û bi alî eskeran de pêçiyên xwe dirêj dikir.

-Lawê min, lawê min! digot bi deqê kelogirî û gazî dikir dayikekê.

Xortekî bi dest û pê, çavreş û li hev hatî jî rêzê derket, destê dayika xwe û eniya xwişk û birayê xwe maçikîr. Keçikeye xame jî wanê hatibûn wir, qewdek gul gihande destê wî, ewî yekê ji wan di ber singa xwe de bicikîr yekê ji kir ber guhê xwe yî çepê û bi bazdan çû ku têkeve nav rêzê û dilokstaranê.

-Oxir be, lawê min! got bi bang dayika wî.

-Stoyanko! qiriya keçika piçûk a ji halketî.

Lê ji qerebalixê dengê wan windabû. Stoyan di nava eskeran de windabû, esker jî di nava mijê de edî nedihatîn dîtin.

Keçika xama pêşmala li ser kirasê xwe hilanî û ser û çavê xwe pê girt...

Gava dayika Stoyan gihîşt malê, bû iske-iskâ wê dolaba

kinca ya textê wê jî hev dîr bûbûn vekir, paçik û kincên zivistanê (çile) bilind kirin û ji bin wan mûmek derxist. Ew li ber xaç (ikon) danî û serê xwe li ber tewand.

Di wê demê de li dora Drago-man tank û top dihatin dîtin. Wext 4'ê maha payizê ya navîn a sala 1885'a bû.



Wê şevê pîra Tsena xewnek dîtibû.

Ewrekî mezin ê ku eskeran hicûm dikirine hebû, Stoyan jî di nav wan de bû. Dayika Meyrem a pîroz! Çi heybetek mezin bû! Gurre-gurra ewra bû, brûsk vedidan erd û ezman dihejiya. Ha ji te re nexwe ev herb bû! Stoyan di nav ewran de windadibû, edî nedihat xwiyâ kirin. Vêca wê çawa be? Pîrek veciniqî û ji xew şiyar bû. Hindur tarî-reş bû. Bi tenê ji derve vîze vîza ba dihat. Ev ceng e. Xwedeo, İsa pêxember wî bihewînin!... Dayika Meyrem a pîroz hay ji Stoyankoyê min hebin!

Heya serê sibê xew bi çavê pîra Tsena neket.

-Apê Petir, çawan e, ku meriv ewra xewna xwe de bivîne? Pirsî serê sibê pîra Tsena.

-Ewr, du maneyên wê hene: ewr hene, ên ku dibin baran, ewr hene, ên ku beladibin diçin. Te kîjan jî wan di xewna xwe de dît? Bersivand Petir.

Ewê xewna xwe jî wî re got. Petirê kal fikirî. Nediha bîra wî ku di şirovekirina xewna de maneya ewrê hanê çiyê. Lê gava ku Tsena madekirî dît û li wî dinihêrt bê ku bîhna xwe bide û bistîne, dilê wî pê şewitî û got:

-Meponije, xewna te xêr e. Ewr tèn maneya nûçean (xeberê) jî, dibe ku namakê ji Stoyanko bigrî.

Rûyê pîreka extiyar bişirî.

Şeş roj paşê, wê namakê ji Stoyan girt a ku hevalekî wî anîbû. Hevalê Stoyan êsirên Yugoslaviyan anîbûn. Pîrê bazda çû cem keşe jî bo ku nama xwe bide xwendin.

Di namê de wiha dinivîsand: "Dayika min, vê namê jî te re dinivîsim, ku bêjim, ez sax û silamet im, û me zora Yugoslaviya birriye. Bila Bulgaristan bi şan û şeref bijî! Ez sax im, Rangel Stoyanov û Apê Dimitir jî sax in û silava ji dayika xwe re dişînin. Hêji Yugoslavî li me fişekên top û tivingan dibarînin, lê gelek ji 'qêrina' me ditirsîn. Ji bo tu bela neyê serê zarokan, wê kayîşa tivingê a nû, ya ku min li mala Tseveta-nov jibîrkiribû bistîne. Emê sibê di newala Dragoman de bawên ser neyara. Gava bizivirim mal, ezê xelatêkê ji Nîşê jî bo Kîna bînim; ji te re lêvekî (baqnotekî) perê Bulgaristan, nota wergêr) dişînim, ji xwe re xercbike; gava bêm mal ezê Radulko hînî gurmîna dengê topan bikim. Lawê te ê te jibîr nekirî."


Stoyan Dobrev Ji bo mam Petro saxî û başî dixwazim. Min ê jê re tivingek Sirb bişanda lê vêga îmkan nîne. Berikên wan dîr diçin, lê belê nişana wan xirab e. Dayê, silavê min li Stoyankê bike."

Dilê Tsenta yê bi keder tijî xweşî bû, rahişt nama xwe û bazda çû mala Stoenkîn. Kêfa wan bîhidud hat. Lê zaftirîn kêfa Radulko jî bo fikandina nû hat. Ji ber ku birakê wê nivîsandibû ku wê wê hîbke. Gava pîra Tsena derket derva hin êsi-

KLASİKÊ EDEBIYATA BULGARÎ  
İvan VAZOV (1850-1921)

Klasikê edebiyata Bulgari İvan Vazov li Bulgaristanê yek ji wan nivîskar û hebwestana ye ku herî zêdetirîn tê xwendin. Wî di hemû cûrên edebiyatê de afirandî-nên hêja dane, afirandî-nên wî jî bo terbiyekirina welatparêzî, demokratî, mirovperwerî gelek giranbuha ne.

Ji xeynî nivîskarî û hebwestaniyê, İvan Vazov têkoşerekî civakî bû. Piştî xelasbûna Bulgaristanê jî bin koledariya Tirkan İ. Vazov bû mebusê gel, wezirê xwendinê û hîndarê Akademiya Zanîstiya Bulgaristan. Hunermendîya xwe ya pişekarî, İ. Vazov bi rengekî zelal di romana xwe yî "Bindestî" de eşkere kir. Di vê romana xwe de bi awakî epîk, bi metodê realizmê ya krîtîk, nivîskar ji yana gelê Bulgar a di bin koletîya Tirka de û geşbûna şoreşgeriya di welatê de a piştî serhildana Nîsana sala 1876-2 sal piştî rizgarbûna Bulgaristanê jî bin koledariya Tirkan-pekaniye.



rên Yugoslavî dît ku li du wan eskereki Bulgar hebû. Ewil ji wê werê Stoyanko bixwe ye, dişibiya wî. Na, na, ne ew e. Çu xwe nêzikê esker kir ji bo ku bipirse ka xebereki jî lawê wê aniyê yan na. Lê belê di jiyana xwe de ev cara ewil bû ku êsirên herbê didî.

-Xwedeo, di ber xwe de digot, nexwe ev Yugoslav in? Nexwe ev mirovnî baş in... Li dayikên wan rebenê... Gelo dizani? Ho xortno, ka bisekinin!

Bezek da xwe çû mal, şûşak araq di dest de zivirî û bi dengelî bilind li eskerên Yugoslavî kir gazî ku bisekinin û got daxwaza hinêk araq îkramê wan bike. Eskerê ku hay ji wan hebû, bi saxikî bisirî û wan sekinand.

-Falim, falim, -spasiya xwe da xuyanikirin eskerên êsir ji hal ketî û ji vexwarina qurtikek araq îkramkirî germ bûn.

-Ji bo min jî qurtêk maye, noş pîra min! Got bi dilxweşî eskerê Bulgar î şuşa araqê bi ser xwe dakir.

-Hemû xaçparêz in... Çima şer dikin?... got pîra Tsena bû ecebmayî gava dinihêrt li eskerên dîr dibûn û diçûn.

Lihevhatin çêbû.

Cejna çêbûna İsa pêxember (Noel) nêzik dibû û esker destpêkiribûn dihatin malê rêdanê (îzinê). Çend heb ji zivirîbûn mala xwe. Lê Stoyan ne di nav wan de bû û tu xeber jî ji wî nedihat. Pîra Tsena dest bi mijûliya kir, derdê wê girandibû, di serê wê gelek tiştên xirab derbas dibûn. Roj dibihurîn diçûn, lê bala wê her li ser derê hewşê bû, gelo zîqîn wê jî derî were... Ha wa Rangel Stoyanov, Petirê lawê Dimko jî, her du birayên hev Stamatov jî vegeriya mala xwe. Pîra Tsena rabû cem wan û pirsî, lê tiştekî jî nizanin. Carekê Stoyankoyê wê ditîne, lê paşê ji ber çavê wan winda bûye. Kezeba pîra Tsena dişewitî, li malê di nava xanî de wekî gêja diçû dihat, mijûliya Stoyankoyê xwe dikir.

-Dayê! Apê Dimitir hatiye! -hêja derçika derî de gazîkirî keçika xwe Kîna bi hilke hilka û bîhncikiyayî.

Cardin rabû serxwe û çû cem Dimitir.

-Bi xer û xweşî hatî, Dimitirko! Ka Stoyankoyê min li ku derê ma? Pirsî pîra Tsena Dimitir jî tiştek nizanibû... Lê dilê wî bi wê şewitî, û mir mirand: "Dibe ku wî şandibin Vidîn. Dibe ku ji ciyekî din bê, di riyek din ra were."

-Xwedeo li ku derkê ma lawikê min! gazinand pîra Tsena.

Derket û çû mala Stoenkîn. Hêja di derçika derî de dilê wê

pêl da. A vêga Stoenkîn ê jî min re bêje ku Stoyankokê min gelek silav bi rêkirine û di cejna Noel de ê were malê. Tenê bêji ji devê Stoenkîn bêjak jî derketa dernekê. Devê wî vebû. Çavê pîra Tsena sor bûbûn.



Gundî hemî derketibûn kuçan. Diçûne pêrgiya alayiya yekemîn a ku jî herbê dizivirî. Di nivê gûnd de li hember mala pîra Tsena du rewî (dîrek) çikandî û bi rewtek din wek devê dasokê bi hev ve girêdan. Ew bi çiklên darê çaman ên bînoke xemilandin. Ji bajarê Pazarcîkê bi aranzî cawek anîn ku li ser wî nivîsandibûn "Eskeren kahreman hûn bi xêr hatin!" bi serê rewta vekirin. Paşê bi serê wan ve ala se rengî bicikîrin Edî ciyê serfirazi-yê li hêviya meşvîna bû.

Û eskerên ku serfirazî bi dest xistibûn dihatin derbas dibûn.

"Dibe ku di piştî van re were, dibe ku dixwaze êvara cejnê bighîje malê, ji xwe ew naxwaze cejna Noelê di nava biyaniya de derbas bike! Hê jî esker yek bi yek, dido bi dido tîn, hêja jî êvarê re gelek heye. Ew ê were. Ew zane ku dil û kezabên van ên vî derê dişewitin, li hêviya wî ne!"

Ji xwe re wisa difikirî dayika reben...



Tsena pîr serê sibê zû çû dêrê. Ew baqnota Stoyan şandibû hûrkir û mûm kirin. Li ber hemû xaçan (ikona) mûm vexistin. Û bi dilekî rehet vegeriya malê.

"Ew ê îro miheqeq bizivire, sibê cejna Noelê ye... İro hê jî xilas nebûye, -ji xwe re dimir-mirand pîra Tsena, - Dayika Meyrem a pîroz, kezeba min bişîne... Xwedeo, dilê min xweş bike..."

Kîna bi bazdan hat û got: -hinêk gundiye din jî vegeriya-ne. Pîra Tsena eniya xwe qermîçand û bi xeyd û hişkane got: -Edî bes e, van xelatên (xerberên) hanê ji min re tînin. De tu ji wek xelkê here pêşiya kekê xwe!

-Dayê ez jî dixwazim bi xwa xwe re herim! -kir gazî Radulko.

Herdu zarok jî bi riya berfin ve hilkişiyân jor, derketin ser rê.

Pîra Tsena jî li devê derê hewşê li hêviya lawê xwe ê ku dibe were sekinî.

Bayekî cemidî jî nava çiyân diqetîya dihat. Berfê, çiya, newal û deşt sipikiribû. Bîna ewra teng dibû.

Dîmahik di rûpelê 7'an de

HINDIK\*\*\*\*\*RINDIK

Yê amade dîke: Z. XAMO

KURD Û WEXT

Komela Kurd li Stockholmê jî endamên xwe re namak şandibû; digot, "Di 23'ê mehê seet di 10'an de kongra komelê heye". Em jî wek endamêkî komelê di wê seetê de li wir hazir bûn. Lê belê hazirbûna me çend pere dikir, ji ber ku piraniya endaman nehati-bûn. Em ên hindik mecbûr bûn ku li benda piraniyê bimana. Me pa û pa û pa... Seet di 12'an de hêdî hêdî "pirani" ber bi hev hat û kongre li ber vebûnê bû. Di vê navbênê de hevalekî endam ket hundur û jî min re got:

-Wah! Ma we destpêkir jî?  
Ma minê çî bigota? Bêî ku bibêjim "Welleh me nêt kiribû..."

HİNGIV

Kenan Evren li Anqerê di civînek xoco û mellel de dipeyvî. Di axaftina xwe de gazin jî alimên dîni dikir: "Xoco û alimên dîndar 'li ser helalî heramiya hingiv' mînaqêşê dikin. Bira di dêlî vîya ve jî millet re bibêjin gelo wê Tirkîye çawa dewlemend bibe û welatên musulman wê çawa bigihîjin welatên pêşketî?"

Muftiyekî rûsipî jî ciyê xwe hêdî hêzî ser xwe kir: -Serokkomarê min, di Quran a Kerîm de ayeta ku welat çawa pêşdikevin û dewlemend dibin tuneye.

KERÊ BAQİL

Riya generalekî Tirk bi nav bîstaneke ketibû. Zengilê hustuyê kerê ku av jî bîrê dikîşand bala wî kişand. Ji cenane bîstên pirsî: -Ev zengilê hanî mezîn ji bo çî di hustuyê kerê de ye?

Mêrik got: -Çaxa ker avê dikîşine ez dengê zengilê dibihîzim. Lê gava dengê zengilê bîrîin ez fahm dikim ku ker sekinî ye û tîm çu dikim. General got: -Ê lê gava ker di çî de (sekinandî) serê xwe libake wê çawa be? Cenani got: -Generalê min, ez benî, ma emê kerekî wek te baqil ji ku bibîn-nin...

DI DİROKA ME DE EV MEH

1 Çileyê Pêşîn 1983: Kenan Aras; hevalbendê PSKT û endamê Komîta Karger a Komela Mamosteyên Tirkîyê (TOB- DER) ji alî cuntayê ve li kuçêke Agri-yê hat şehîdkirin.

5 Çileyê Pêşîn 1605: Di navbera Kurda (di bin seroktiya Kerîm Xan Zend da) û Farisan (di bin seroktiya Nadir Şah) de li herêma Dimdimê şerekî giran dest-pêkir.

9 Çileyê Pêşîn 1970: Li Farqînê şubeya DDKO ve bû.

10 Çileyê Pêşîn 1976: Şefîk Özdemir; endamê PPKK, serokê FEN- DER a Diyarbêkr ji alî Maoîstan ve hat şehîdkirin.

12 Çileyê Pêşîn 1980: Li gundekî Qamişliyê hêzên mêtîngêkarên Tirk êrişî malekê kirin. Di vê êrişê de endamê Komîta Merkezî ya KAWA, M. Emîn Mutlu û 14 kesên din hatin şehîdkirin.

15 Çileyê Pêşîn 1946: Ordiya İran ket Mehabadê, KOMARA MEHABAD hilweşiya, Qadî Muhamed û hin endamê Komîta Merkezî ya PDK-î hatin girtin.

16 Çileyê Pêşîn 1984: Hevalbendê PPKK û endamê KKDK Abdulkarî Ay li Elezizê ji alî faşîstan ve hat kuştin.

17 Çileyê Pêşîn 1908: Komela Hekarî û Pêşketina Kurd (Kürt Teavun ve Teraki Cemiyetî) li Mûsul û Bedlî-sê şubeyên xwe vekir.

17 Çileyê Pêşîn 1959: Li Tirkîyê 49 kesên pêşverû û welatparêzên Kurd hatin girtin. Ev girtin bi navê "bû-yera 49'an" tê binavkirin.

20 Çileyê Pêşîn 1924: Xalid Begê Cibrî, Yusif Ziya û çend hevalên wan ji alî leşkerên Tirk ve hatin girtin.

23 Çileyê Pêşîn 1906: Serhildana Abdurrahman Paşayê Baban destpêkir.

24 Çileyê Pêşîn 1919: Serhildana Şêx Eşref tîk çû.

24 Çileyê Pêşîn 1924: Bîrtanya û Iraqê bi hev re belavokê imzekirin û belavkirin. Di vê belavokê de mafê Kurdên Iraqê ji bo hukumetê Kurdî bê danîn hebû.

24 Çileyê Pêşîn 1979: Qetliama Maraşê. Li Maraşê faşîstan êriş birin ser xelkê û bûn sebêbên qetliamek mezîn. Li dora 300 kesî di vî şerî de hat kuştin.

28 Çileyê Pêşîn 1970: Li Hezo (Kozluk) yê şubeya DDKO ve bû.

29 Çileyê Pêşîn 1977: DDKAD (Komela Jinên Şoreşgerên Demokrat) hat damezirandin.

31 Çileyê Pêşîn 1974: PSKT (Partiya Sosyalist a Kurdistanê Tirkîyê) hate damezirandin.

Çileyê Pêşîn 1840: Mirê Botan Bedirxan Beg li dijî Osmanîyan li herêma Botan serxwebûna xwe îlan kir û ji bo Kurdistanê serbixwe dest bi şer kir.

Çileyê Pêşîn 1969: Li İstebolê kovara Doğu derket.

Çileyê Pêşîn 1978: Li İstebolê kovara Kawa derket.

Çileyê Pêşîn 1980: CUD (Cepha Niştîmanî ya Demokratîk a Iraqê) hat damezirandin.

Çileyê Pêşîn 1980: CWQD (Cepha Niştîmanî ya Netewî ya Demokratîk a Iraqê) hat damezirandin.

Çileyê Pêşîn 1980: Kovara Newroz li Almanya dest bi weşanê kir.

Not: Di hejmarê berê de hatibû nivîsîn ku "Şark ve Kurdistan" di 15'yê Mijdara 1908'an de derketiye. Rastiya wê 19'yê Mijdara 1908'a ye.

## LEŞKERÛN TIRK QAMIŞLOYÊ GULEBARAN KIRÛN

- Xortekî Kurd hat şehîdkirin.
- Gulebaranê, nefreta xelkê kişand ser xwe

Roja 22'yê Çiriya Paşin, leşkerên Tirk ên Nisêbinê Mehela Qudûrbeğ a Bakûrê Qamişloyê (Kurdistanê Sûriyê) gulebaran-kirin. Di êrişê de xortekî 23 salî yê bi navê Semîr Hisko, kurê Xidir (ku di nav xelkê de bi navê Kamûranê Remiko dihat nasîn) hat şehîdkirin.

Êrişa leşkerên Tirk û şehîdbûna xortê Kurd nav xelkê Qamişloyê de nefretê mezîn kişand ser xwe. Xelkê Qamişloyê daketin kolanan û êriş rûşşikirin.

Bi firehî xebera li ser vî bûyê hûnê di hejmara bê ya Armançê de bibînin.

## LÎ WANÊ GUNDAN VALA DIKÛN

- Bi navê "Proja Başûrê Wanê" 10-15 gundan, bi zorê ji cîh radikin, di gundekî de didin ser hev.
- Armanç, li herêma bêtirkirina kontrola dewletê ye.
- Gundî li dijî pîlanê radiwestin.

Kolonyalistên Tirk ji bo têkoşîna gelê Kurd bişkinin û çavê gel bitirsînin gelek dek û dolaban digerin. Naveroka wan pîlanên yek e; Zulm, zulm û dîsa zulm.

Van çend mehên dawî karbidestên Tirk dixwazin gundên merkezi li Kurdistanê ava bikin. Li gor vî pîlanê wê 10-15 gundan ji ciyê wan rakin bigihînin hev. Armanç ev e ku dewlet karibe kontrola xwe li ser xelkê herêma bi hêsanî bi cîh bîne. Li Şirnaq û Dêrsimê dest bi vî karî kirine. Nuha


li gor agahdariyên Waliyê Wanê ev pîlan wê li Çataxê, li Başqalan û Gûrpînarê bê bi cîh anîn.

Bêguman wê ev pîlan gelek zirarê bigihîne gundiyarên. Gundî wê ji erd û avên xwe bîn bi dîrxistin. Dewlet wê tu alîkariyê bi gundiyan re neke. Gundî wê bi xwe malên xwe bikişînin û ji xwe re xaniyan li gundên nuh ava bikin. Gundî bi hemû hêzên xwe li dijî vî projê derdikevin. Lê dewlet jî bi darê zorê dixwaze vî projê bi cîh bîne.

## Li Dêrsimê cûntayê cardin xwîn rijand

- Di êrişa ordiya xwînrêjê de 8 Kurd hatin şehîdkirin
- Leşkerek mir û zabitek û leşkerek jî birîndar bû.

Hêzên kolonyalist li Kurdistanê carek din xwîn herikand û destên xwe yê qilêrî di xwîna 8 ciwanên Kurd gerand. Di 24'yê Mijdarê de li Owaciqê navça Dêrsimê li gundê Çayustu leşkerên cûnta faşist 8 endamên TKP/ML Partizan kuştin.



Cesedê keçika ku ji alî cûntayê ve hate şehîdkirin

8 endamên Partizan li herêma Hurmuk li gundê Çayustu di xaniyekî de xwe şarge kiribûn (veşartibûn). Serê sibê leşkerekî giran bi helikopteran girtin ser wan, xaniyê ku Partizan tê de şarge bûbûn ji çarhawêlê de gulebaran-kirin. Li ser vî yekê Partizan jî bersîva wan dan û bi navbera wan û leşkeran de şerekî giran derket. Di şerê de her 8 endamên TKP/ML Partizan jî (ji van yekê jî keçikê) hatin şehîdkirin. Û ji hêzên cûnta faşist jî leşkerek mir, zabitek û leşkerek jî birîndar bûn.

Di ser vî qetliamê re jî cûntayê leşkerekî giran şand ser herêma Owaciqê û dest bi operasyonên

mezin kir. Lê belê di derheqê ga girtî hene ya tunene tu beyanek resmî tune ye. Bes eşkere kirin ku operasyonêk bi navê "Balyoz Harekati" li herêma tê meşandin.

Piştî vî hêdîsê di çend rojan û beriya rojnama me bikeve çapê, di 2'yê mehê de li navça Mazgîrtê hêzên kolonyalist çar endamên TKP/ML Partizan din jî kuştin. Ji van 2 keçik û 2 jî peya bûn.

Di yekê Tebaxê de jî cardin 9 hevalên TKP/ML Partizan li Owaciqê ji alî leşkerên ordiya Tirk ve hatibûn şehîdkirin.

### Konferansa Akademiya Tutzingê

Bi navê "Kurdên li Almaniya Federal û rewşa wan" ji alî Dêrên Protestan yê Almanî ve li nêzikî bajarê Munihê li Akademiya Tutzingê konferanse hat amadekirin. KKDK jî bi axaftinekî tevî wê konferansê bû. Di konferansê de bi dîr û dirêjî li ser rewşa Kurdên li Almaniya Federal û Kurdistanê hat axaftin.

### Civînek ji bo rojnamevanan

Di 26'yê Çiriya Paşî ya 1986'an de li bajarê Bonnê konferanse jî bo rojnamevanan hat amadekirin. Di civîna Komelên Yunaniyan, KOMKAR û KKDK beşdar bûn. Van rêxistinên li ser rewşa Kurdistanê û Qibrisê agahdarî dan û êrişên barbarî yê dewleta Tirk jî raxistin berçavan.

M. Elî /Hamburg

### Erzurum

#### Kardîtin bû xewnê şeva

Çendekî berê Muduriyeta Hindekarîya Netewî (Millî Eğiitim Müdürlüğü) ya Erzurumê îlana 2 ciyên kar ên vala da. Li gor beyana resmî ji bo van 2 ciyên vala 700 kesî muraçaat kir.

Ji bo Dezgeha Maliyê jî 70 karker lazim e lê 2000 kesî muraçaat kiriye.

### Hamburg Biyaniyan rexne li hilbijartinan girtin

□ Li Almaniya Federal, li Hamburgê, di 9'yê Mijdarê de hilbijartinan mehelli çêbû. Li vî wela di hilbijartinan de mafê xerîba yê dengdane tune ye.

□ Rêxistinên karkerên Tirkîyê, Kurdistanê, İspanyayê, Portekîzê, Yunanîstanê, İrânê û İraqê giştî bi hev re li dijî vî neheqiyê derketin û rojekî berî hilbijartinê li Hamburgê hilbijartinek sembolîk çêkirin û dengê xwe dan. Hilbijartinê gelekî bala millet kişand. Di hilbijartinê de bi tevayî 507 deng hate dayîn.

□ Cardin, bi Kurdî, Tirkî, Yunanî û hin zimanên din axaftin hat kirin û ji bo rojnamevanan civînek li parlamentoyê hat çêkirin. Ya din jî, Devrimci-İşçi, Hamburg Halkevi, KKDK, KOMKAR bi hev re belavokek belav kirin.

### Di zîndana Bartînê de greva birçîbûnê

□ Ji 6'yê Çiriya Pêşî a 1986'an vir de ye ku girtiyan zîndana Bartînê di grevê de ne. Sebeba greva wan; şertên jiyana girtiyan ne baş e, divê ku berpirsiyarên zîndanê li ser vî yekê bisekinin.

Her wiha divê ji bo seruştinê îmkaniyeta ava germ bê dayîn. Xwarinên wan paqij bê çêkirin. Heta nuha berpirsiyarên zîndanê tu bersiveke girtiyan ne daye û girtî jî greva xwe her didomînin.

### Hezo

#### Li ser şoreşgeran tade û zilmeke nû

Di van demên dawî de li Hezo (kozluk) yê li ser şoreşger, demokrat û wela parêzan tade û zilmeke nû destpêkiriye.

Kesên ku piştî derbê li Hezo hatine girtin an ketine bin çavan û ên ceza xwariyê, hemûyan gazî qereqolê dikin, îmza wan distînin, fişên xusûsî hazîrkirine, bi wan didin dagirtin. Van kesan dema karekî wan li derveyî Hezo derkeve an jî bi xwazin derkevin derveyî Hezoyê divê haya qereqolê bigihînin. Û ji bilî vî yê jî ev kesên han li gorî tesbîtîkirina qereqolê divê 15 roj an ya jî mehê carekê herin li serî qereqolê xî. Bi vî yekê dixwazin çavên şoreşger û pêşverûyan bitirsînin û wan bêtesîr û bê-moral bihelînin.

### PEÎNE

## Nezîr Şeker hat bibîranîn



Tirba N. Şeker bi tacegulan xemilandin

5 saliya şehîdbûna Nezîr Şeker li Almaniya Federal li bajarê Peîne ji alî hevalên vî ve hat bibîranîn. Nezîr Şeker endamê KKDK ê bû û 5 sal berê ji alî faşîstên Tirk ve hatibû şehîdkirin.

Ji bo bîranîna Nezîr Şeker hevalên vî yekê ji KKDK a Celle di 28'yê Çiriya Paşî de çûn li ciyê şehîdkirina wî merasimek çêkirin û tacegulek danin dewsa ku lê hatibû şehîdkirin. Hevalekî wî li ser jiyana û têkoşîna wî axaft. Li ser navê VVN (Komela Antî-Faşîstên li Almaniya Federal) jî yekî axaftinek kir û piştgiriya xwe bi gelê Kurd re nişan da.

## Çend pirtûkên nû

Van çend salên dawî li derveyî wela weşanên Kurdî û yê li ser Kurdan zêde dibin û bi vî awayî kitêb xana Kurdî dewlementir dibe. Di vî meha dawî de çend pirtûkên nuh derketin. Ewana ev in:

### RÊZIMANA KURDÎ BÎ ZIMANÊ ALMANÎ

Rêzimana Kurdî bi zimanê Almanî di destpêka Çiriya Pêşî 1986'a de çap bû. Ev cara yekemîne ku rêzimana Kurdî bi zimanê Almanî dertê. Rêziman bi hevkarîya zimannasê navnetewî Prof. Mac Kenzie û Enstîtuya Kurdî-Bonn hatiye wergerandin. Rêziman ji alî Celadet Alî Bedîrxan û Roger Lescot li Parîsê hatibû nivîsandin û weşandin. Rêzimana Kurdî ya bi zimanê Almanî 400 rûpel e. Buhayê wê 25 DM. ye, yêncîldkirî 89 DM. ye. Navnîşana temînkirina pirtûkê:

Enstîtuya Kurdî  
Colmantstr. 5  
5300 Bonn 1 BRD

### WENDABÛN

Romanek nuh bi Kurmancî ye. Nivîskarê wê Şahîne Bekîrê Soreklî ye. Wendabûn romana Soreklî ya yekemîn e û ji alî Enstîtuya Kurdî hatiye çapkirin. Roman 130 rûpel e û buhayê wê 12 DM. ye. Navnîşana temînkirina romanê:

Enstîtuya Kurdî  
Colmantstr. 5  
5300 Bonn 1 BRD

### KÛRTLAR (KURD)

Ev pirtûk ji alî Bazil Nikitin ve hatiye nivîsandin û ji alî weşanê Özgürlük Yolu (Riya Azadî) ve bi Tirkî hatiye çapkirin. Çapa wê ya yekemîn wek 2 cîld; cîldê ewil 1976 û cîldê diduyan jî di sala 1978'a de hatibû çapkirin. Nuha her du cîld kirine yek û wek çapa diduya çap kirine. Pirtûk 568 rûpel e û buhayê wê 25 DM. ye.

### Civîna Giştî ya 2. a KKDK'yê

□ Di Çiriya Paşî ya 1986'an de civîna giştî ya Komîte û Komelên KKDK'yê li Almaniya Federal pêk hat. Civîna bi tevayî li ser kar û barên KKDK'yê û kêmasî û xebata wê ya dahatû bû. Di civîna de hin biryar hatin girtin. Jê hinek ev in:

- Civîna û semîner divê bêne zêdekirin.
- Kampanya abonetiye jî bo rojnama Armançê.

### Jiyana Yılmaz Güney dibe film

• Fîlmê dokumenter jî bal Fatoş Güney tê hazîrkirin.

Fatoş Güney (pîreka Yılmaz Güney), di 2 saliya mirina Yılmaz Güney de li ser jiyana û têkoşîna wî fîlmekî dokumenter çêdike. Li ser vî xebata xwe Fatoş Güney dibêje ku, "Bi xebatek wiha meriv him dikare bi firehî bigihê gel û him jî ev yek dibe tiştêkî daîmî". Fîlm, bi jiyana û têkoşîna Yılmaz Güney re wê li ser hin bûyerên Tirkîyê ên civakî jî bisekin.

Qasî agahdariya ku Fatoş Güney daye: wê ev fîlm di gelek televîzyonên cîhanê de bê nişandan. Fîlm wê heta çend meha temam bibe.



# Kurdologeka Fransî

## Joyce BLAU



Kurdnasa hêja Joyce Blau li ser masa xebatê

### Mahmûd LEWENDÎ

□ Gelek Kurdologên biyanî hene ku ji alî me kurdan ve baş nayên naskirin. Ji wan hinek, me tenê navê wan bihistiye, yan jî mumkun e, ku kitêbek, miqaleyek wan bi destê me ketibe. Lê bi tevayî derheqê van kurdolog û kurdnasan de tu zanîneke me ya têkuz tune. Tenê di hin kovaran de li ser du sê kesên (wek Basil Nikitin û Thomas Bois) hin tişt hatine nivîsîn. Lê ew jî têr nake.

Îro, ji van kurdolog û kurdnasan em dikarin navê gelek bijmêrin. Herwekî M. Garzanî, A. Caba, M. F. Justî, Hartmann, Rudenko, Le coq, Roger Lescot, Basil Nikitin, T. Bois, P. Beider, Mac Kenzie, M. V. Bruinnesen, V. Minorsky, Joyce Blau, Nyberg, C. J. Edmonds, E. N. Mc. Carus, A. Socin û hin gelekên din. Lê, gelo derheqê jiyana û xebata van kesan de, ji alî me kurdan ve çi û çiqas hatiye nivîsîn? Ku van kesan jî bi kar û xebatên xwe yên zanistî (ilmî), piştgiriya gelê kurd û kultur û tarîx û zimanê wî kirine.

Di vê nivîsara xwe de emê qala jiyana û xebata kurdnasekê bikin. Ev kurdnasa me Joyce Blau ye, ku neha li Parisê di Unîversîteya Sorbonnê de seroka beşê kurdî ye.

Joyce Blau bi eslê xwe Fransî ye. Di 18'yê Adara 1932'an de li Misîrê li bajarê Qahrê hatiye dinê. Dibistanên seretayî, nawendî û lîseyê li Qahrê xwendîye, piştî xwendina xwe li Parisê domandiye.

Di 1959'an de, li Parisê di Zanîngeha Zimanên Rojhelatî de diploma beşê Erebi wergirtiye.

Di sala 1962'an de, li Brukselê di Unîversîteya Azad (Université Libre) de metrîsa xwe li ser Erebi çêkiriye. Di 1966'an de dîsa li Parisê di Zanîngeha Zimanên Rojhelatî de diploma Beşê Kurdî temam kiriye. Di 1969'an de, her di wê zaningehê de diploma Beşê Farsi wergirtiye. Di 1973'yan de jî li Unîversîteya Sorbonê, di beşê Rojhelatî û Etnolojî'ye de doktora derece 3'yan (docteur de 3<sup>e</sup> cycle) wergirtiye. Nuha jî haziriya teza doktora dewletê (Thèse de doctorat d'Etat) dike ku ev teza wê li ser zimanê Lurrî ye.

Joyce Blau ji bil zimanê xwe yê zikmakî Fransî, her weha bi Farsi, Erebi, Rûsî, İngilîzî û Kurdî (Kurmançî û soranî) jî dizane.

Joyce Blau ji 1970'yê vir de ye ku li Parisê di Unîversîteya Sorbonê de, li qismê Zanîngeha Zimanên Rojhelatî (Ecole Nationale des Langues Orientales Vivantes), di beşê Kurdî de dersên zimanê Kurdî (soranî û kurmançî) û Tarîx û Medeniyeta Kurdan dide.

Gelo Joyce Blau jî ber çî sedeman an jî bi tesîra çî û kê dest bi xebata li ser ziman û edebiyatê û tarîxa Kurdî kir? Ev yeka me ji wê bixwe pirsî; (di 15.10.1986'an de li Parisê), weha got: "Di 1959'an de li Parisê, min Kamûran Bedîrxan naskir. Bi tesîr û alîkariya wî, min destpêkir li ser pîrsa Kurdî xebitîm. Her weha zimanê Kurdî jî ez li ber destê wî fêr bûm. Di 1963'yan de min teza xwe ya li ser Kurdan jî dîsa bi alîkariya wî nivîsand.

Di 1965'an de ji bo dîtina Thomas Bois ez çûm Beyrûdê. Li wê derê min ew dît. Tesîra wî jî gelekî li ser min çê bû ku wê xebata xwe ya li ser Kurdan bidomînim. Heta roja mirina wî jî têkilî û dostaniya me her hebû. Ez dikarim bi dilxweşî wê yekê bibêjim ku di vê bareyê de mamostayê min ê herî mezin û baş be

guman Thomas Bois bû. Wî gelekî alîkariya min kir, çî ji alî materyal û kitêban, çî jî malûmatên bi devkî yên li ser Kurdan. Wî kitêbxana xwe jî bo min amade kiribû, çî wext, min çî bixwesta qet texsîr nedikir...

Di 1970'yê de li Parisê di Zanîngeha Zimanên Rojhelatî de min dest bi mamostetiya zimanê Kurdî kir. Berî min Kamûran Bedîrxan mamostê beşê Kurdî bû, lê piştî ku ew teqawît bû, ez ketim şûna wî...

Ev beşê Kurdî di 1945'an de ji bal Roger Lescot hat vekirin û ew bi xwe jî mamostê wî beş bû. Di 1946'an de Roger Lescot ji ber hin kar û barên resmî çû Şamê û ji wê tarîxê heta 1970'yê Kamûran Bedîrxan mamostetiya beşê Kurdî kir.

Di vê zaningehê de ji 1945'an heta 1973'yan tenê dersên Kurmançî dihat daîn. Lê ji 1973'yan û şûn de me dest bi Soranî jî kir. Ji wê rojê heta îro em di her du salên pêşîn de dersa Soranî û di herdu salên dawîn de jî li gel soranî dersa Kurmançî jî didin. (Beşê Kurdî 4 sal e.)

Piştî re li gel ziman her weha me dest bi dersa tarîx û medeniyeta Kurdan jî kir, ku ev ders ji 1975'an û virde ye her tê daîn.

Di nabêna salên 1976-1978'an de Dr. A. Qasimlo jî di beşê Kurdî de wek mamoste kar kir. Wî bi taybetî dersa tarîx û medeniyeta Kurdan û her weha dersa zimanê Kurdî jî dida, piştî re çû Îranê."

Joyce Blau ji bo wê xebata xwe ya li ser Kurdan, gelek caran çûye Kurdistanê û welatên ku Kurd lê hene. Ji van gerên wê hinek li gor tarîxa xwe ev in:

- 1965- Lubnan (Beyrûd)- li gel Thomas Bois û Kurdên Beyrûdê têkilî daniye.
- 1966- Sovyet (Leningrad)- Qanadê Kurdo û Kurdên li Lenîngradê ditiye.
- 1967- Lubnan û Iraq (Amêdî, Zaxo û Sincar)
- 1968- Iraq (Hewlêr û Kerkûk)
- 1970- (Çûye Silêmanîyê, Ranyayê û Hecî Umran'ê, di vê gera xwe de wê Melle Mistefa Berzanî jî ditiye, di wê dîtîne de Kamûran Bedîrxan jî li wê derê bûye.)
- 1971- Sovyet (Moskova - Lenîngrad) li gel Kurdên wê derê têkilî daniye
- 1972- Sovyet (Moskova - Lenîngrad) çûye cem Casimê Celîl
- 1973- Iraq (Bexdad) Çûye cem hin Kurdên Bexdadê
- 1974- Îran (Tehran, Loristan, Şahar Mahal, Kermanshah)
- 1976- Îran (Tehran, Loristan, Şahar Mahal, Elam)
- 1980- Îsraîl (Tel-Aviv, Qudus) di vê gera xwe de li ser Kurdên Yahudî xebitiye
- 1981- Îsraîl (Qudus)- Li ser daxwaza Unîversîteya Hebreîk a Qudusê du mehane di vî unîversîtê de dersa Kurdî daye.

Joyce Blau jî derveyî seroktiya beşê Kurdî ew her weha endama van etablîzmanan (Korr û Sazûman) ye jî:

- 1- Konseya Zanîngeha Zimanên Rojhelatî-Paris
- 2- Komîsyona Pîsoran a Unîversîteya Bretagne a Rojavayî
- 3- Konseya Bilind a Konsultatîfa Unîversîtê Seksiyona 57'an-Paris
- 4- Konseya Neteweyî ya Hindekariya herî Bilind û Lêkolînan
- 5- Merkeza Lêkolînên Îlmî ya netewî.

### BERHEMÊN WÊ

Pirtûkên wê yên çapkirî

1—Le Problem Kurde, essai historique et sociologique, (Pîrsa Kurda, serlêdanek tarîxî û sosyolojîk) Bruksel, 1963, 80 rûpel.

2—Dictionnaire Kurde-Français-Anglais, Bruksel, 1965 (Ferhenga Kurdî-Fransî-İngilîzî) Bruksel 1965, XIX+259 rûpel e. Ev ferheng piştî re Dr. Şivan wergerand Tirkî, û bi navê "Ferhenga Kurdî-Tirkî" di 1971'an de li Ewropayê hat çapkirin. Ev ferheng cara 2. di 1975'an de, di nav "Weşanên Şivan" de li Belçikayê hat çapkirin. 109 rûpele, nêzikî 10 hezar peyv tê de heye.

3—Textes Kurdes Kurmandjî, (Tekstên Kurdî-Kurmançî), Wiesbaden, 1968.

4—Le Kurde d'Amadiya et du Djabal Sindjar-Analyse linguistique, textes folkloriques, glossaires (Kurdiya Amadiyê û Cebel Sincarê, analîza lîngwîstîkî, tekstek folklorîk û ferhengok) Paris, 1975, 254 rûpel.

5—Les Langues Iranienne, I.M.Oranski. (Zimanên Iranê), Paris, 1977. Ji Rûsî wergerandiye Fransî.

6—Manuel de Kurde (Sorani), (Rehbera Kurdî-Soranî) Paris, 1980. Ev kitab li ser giramê soranî ye, di rûpelên dawî de jî çî daye ferhengokeke fransî-kurdî û kurdî-fransî, 286 rûpele.

7—Les Perles d'un Colliers, (Mirwariyên Gerdenê) Paris, 1981, 95 rûpel, tê de tekstên soranî hene, ji bo zanîngehê hatiye amadekirin.

8—Mémoire du Kurdistan (Bîranîna Kurdistanê), Paris, 1984, 224 rûpel. Ev kitab li ser literatûra devkî û nivîskî ya Kurdan e, her weha tê de qala jiyana û berhemên şair û nivîskarên Kurdan jî dike.

9—Contes Kurdes, (Çîrokên Kurdî) Paris, 1986, 170 rûpel.

10—Element de Grammaire Sorani (Elementên Gramera Soranî), Paris 1975, 90 rûpel. Çapa 2.

Joyce Blau, li derveyî wan kitabana, her weha gelek nivîs û meqale jî di gelek kovarên çûre-çûre yên Fransî, İngilîzî, Kurdî û Tirkî de nivîsîne. Ji van meqaleyên wê hinekan em li jêrê dinivîsîn:

1—"Le Mouvement National Kurde" Tevgera Netewî ya Kurda), di kovara Les Temps Modernes, no:456-457 (Temmuz-Tebax 1984) Paris, rûpel 447-461.

Ew di vî nivîsara xwe de bi taybetî li ser Tevgera Kurdên Tirkîyê sekiniye.

2—"Problems in the Unification of Kurdish Language" (Pîrsa Yekîtiya Zimanê Kurdî), di kovara New Pesh-Merga, no:18 (1984), Nacka (Swêd), rûpel 14-19.

3—"Kürtçe Dilbilim ve Sözlük Çalışmaları" (Xebatên Lîngwîstîkî û Ferhengî yên Kurdî), di kovara Studia Kurdica no:1-3, sal:2, (Nisan 1975) Paris, rûpel 60-71.

4—"Trois texte de Folklore Kurde" (Sê tekstên Folklorîkên Kurdî), di kovara Correspondance d'Orient Etudes, rûpel:29-50. Paris, 1980 (?).

5—"Les études de linguistique et de lexicographic Kurdes" (Xebatên Zimannasî û Ferhengî ya Kurdan) di kovara Verbum; revue de linguistique publiée par l'Université de Nancy II. tome:VI., 1983 rûpel 1-8.

6—"Les Kurdes" (Bibliyografya Kitabên Kurdî), di kovara Studia Iranica/Abstracta Iranica, no:1 (1978) rûpel: 94-101 no:2 (1979), rûpel: 100-108, no:3 (1980) rûpel: 31,97,98,99,184, no:4 (1981) rûpel: 134, no:5 (1982), rûpel: 32, 115, 199, no:6 (1983), rûpel: 26, 85, 141 - (Ev kovar ji alî beşê İranolojî ya Înstîtuya Fransa ya Tehranê li Parisê her sal hejmarek wê derdikeve.)

7—"Pirtûkên Nû" Hêvî, no:1 (1983), Paris, rûpel: 59

8—"Bîranîna Tewfîq Wehbî" Hêvî, no:2 (1984), Paris, rûpel: 13-16

9—"Pirtûkên Nû" Hêvî, no:2 (1984) Paris r: 67

10—"Pirtûkên Nû" Hêvî, no:3 (1985) Paris, r: 87

11—"Mirina Hesênê Qizilci" Hêvî, no:4 (1985) Paris, nr: 7-10

12—"Bîranîna Thomas Bois" Hêvî, no:4 (1985) Paris, r: 11-13

13—"Pirtûkên Nû" Hêvî, no:4 (1985) Paris, r: 62

14—"Mirina Zanayê Mezin Qanadê Kurdo" Hêvî, no:5 (1986) Paris, r: 7-15

15—"Hêmin jî Mir" Hêvî, no:5 (1986) Paris, r: 19-24

16—"Pirtûkên Nû" Hêvî, no:5 (1986) Paris, r: 70

17—"Les Juifs aux Kurdistan" (Yahudiyên Kurdistanê), broşureke, li ser tarîxê tune

18—Trois textes de Folklore Kurde, —(Sê text ji Folklorî Kurdî) Correspondance d'Orient Etudes-Paris.

Joyce Blau her weha di gelek ansiklopediyan de madde Kurd û Kurdistanê jî nivîsiye.

Ji van ansiklopediyan jî bi taybetî "Dictionnaire des literatures-Larousse; volume: 1-2, Paris 1985" ya herî girîngtir e. Ji ber ev ansiklopediya cara yekem e ku çî dide nivîseke li ser edebiyata Kurdî. Muhîmîyeta wê ansiklopediyê ew e ku kutubxaneyên sereke yên hemû dewletan wê ansiklopediyê dikirin. Joyce Blau di beşê 1.a wê ansiklopediyê de, li ser van kesan nivîsiye:

- Ereb Şemo — rûpel: 298
- Cîgerxwîn — rûpel: 458
- Goran — rûpel: 642
- Hêmin — rûpel: 697
- Ahmedê Xanî — rûpel: 832
- Hacî Qadirî Koyî — rûpel: 847.

Her weha di rûpela 688'an de jî artiklek li ser Kovara HAWAR (1932) ê nivîsiye. Ji rûpel 851 ta 853 jî artiklekê dîr û dirêj bi tewayî li ser edebiyata Kurdî nivîsiye.

Joyce Blau ji bo xebatên xwe yên pêşî (dahatû) jî programmeke dîr û dirêj çêkiriye; lê ji xebata wê, bê guman ya herî mezin teza wê ya "doctorat d'Etat" ye ku li ser zimanê Lurrî ye.

Joyce Blau hin çîrokên Kurmançî li gel wergerên wan ên Fransî hazir kiriye, ku ewê jî di dawiya 1987'an de tekeve çapê.



Joyce Blau sala 1970'yê li Hecî Umranê (Kurdîstana Iraqê) (E)